# Welatê Me

ROJNAMEYA HEFTEYÎ · SAL: 1 HEJMAR: 36 · 23 TÎRMEH 1995 · BUHA: 40.000 TL(KDVD)


Dayikên girtiyan di civîna çapemeniyê de (20.7.1995, İHD) daxuyaniya xwe bi kurdî kirin. Xwendevanino, dewra di her warî de bikaranîna zimanê kurdî ye.

# JI BO AŞTIYEKE BIRÛMET

## 10 hezar girtiyên PKK'yî û bi hezaran welatparêz di rojiya birçîbûnê de ne



● Li Stenbol, Edene, Diyarbekir, Meletê û li gelek bajaran, bi sedan lêzim û dayikên girtiyan, bi mebesta piştgiriyê ketin rojiya birçîbûnê. Di 20'ê tîrmehê de jî li Washingtonê, Londra, Parîs, Cenevre, Stockholm, Den Hang, Berlîn, Frankfurt, Atîna û Moskovê bi hezaran kes ji bo piştgiriyê ketin rojiya birçîbûnê.

● Rojiya birçîbûnê ya ku di 14'ê tîrmehê de dîlên (êsîr) PKK'yî ve ji bo sekinandina şer û bicihbûna aştiyeke birûmet, dest pê kiribûn, her diçe berê xwe fireh dike. Li hemû girtîgehên bajarê Kurdistanê û li yên Tirkiyeyê, zêdeyî 10 hezar dîl, beşdarî rojiyê dibin.

Rûpel 2

## Dewlet li pey girtina NÇM'ê ye!

● Der heqê Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM) de, Wezareta Ticaraet û Sanayiyê, bi riya Mehkemeya Asliye ya Stenbolê doza girtinê vekir. Sebeba girtinê ev e: "Li navenda NÇM'ê gelek dokumantarên qedexekirî, timtêl û malzemeyên artêşa tirk hatine bidestxistin. Ji ber vê yekê ev sazî, li gorî armancên ticarî naxebite û lazim e bê girtin."

● Li ser dozvekirina Wezareta Ticaret û Sanayiyê, ji NÇM'ê Nuray Şen ev got: "Dewletê kir û nekir, nikaribû navenda me bi riyên din bigire. Dawiyê ji bo girtinê sebeb dîtin û dibêjin saziya we ne li gorî prensîbên ticarî hereket kiriye. Helbet armanca wan girtine. Di vê meseleyê de lazim e herkes agahdar be û piştgiriyê bide vê saziyê."

### Komeleya Mafên Mirovan (İHD), piştî xebata 9 salan ber bi hedefên nû ve diçe

## Dewra mafên mirovan

● Komeleya Mafên Mirovan (İHD), di sala 1986'an de bi pêşkêşiya 98 kesan ve di 17'ê tîrmehê de hate avakirin. Vêga zêdeyî 15 hezar endam, 58 şûbeyê İHD'ê hene. 1994'an Kongreya 32. a Federesyona Navneteweyî ya Mafên Mirovan endamtiya İHD'ê qebûl kir.

● Serokê İHD'a Stenbolê Ebûqat Ercan Kanar: "Em saziyeke wiha ne ku dewlet tehemulî me nake. Em bûne aboneyên mehkemeyan. Hem îdeolojiya resmî û hem jî medyaya desthilat, ji me aciz in."

Rûpel 8-9

### Bangawaziya Abdullah Öcalan

Bi rastî jî mirovê kurd, ji hemû aliyan ve hatiye xistin. Em li cîhanê binêrin, temet (bi qasî) şexsiyeta mirovê kurd, şexsiyeteke wisa belengaz nayê dîtin. Mirovê kurd, ketiye rewşeke wisa ku êdî nema tê naskirin. Daxwaza min, ne êşandina we ye. Daxwaza min xurtkirina we ye.

Rûpel 16

### 'Rewşenbîr mejiyê gel in'

Li Kölnê bi beşdarbûna 120 rewşenbîrî, Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistanê (YRWK) konferansa xwe ya 5'an li dar xist. Dîvan ji van kesan pêk hatibû; Maşallah Öztürk, M.Emîn Pêncewênî, Selim Ferat, Mustafa Reşît û Fatma Dikmen. Di nav wan de jî, Maşallah Öztürk bû serokê dîvanê.

Rûpel 13

### Werger û mantiqa zimên

Dîroka wergerê bi qasî dîroka mirovahiyê kevin e. Ji bo ku mirovên bi zimanên cur bi cur dipeyivin, ji hev û din fem bikin, di her demeke dîrokê de, pêwistiya komên mirovan, gel û neteweyan bi wergerê hebûye.

Rûpel 11

### Fransayê sûcê xwe pejirand

Ev 13 hezar mirov berî bikevin riya kampê Auschwitzê ji aliyê polîsên frensî ve li Stadyûma Vel d'Hiv hatibûn civandin. Piştî re naziyan ew şandibûn kampên mirinê û piraniya wan kesan hew zivirîbûn.

Rûpel 5

www.arsivakurdi.org

# Ji bo aştiyeke birûmet

Rojiya birçîbûnê ya di 14'ê tîrmehê de ji aliyê girtiyên PKK'yî ve ji bo ku meseleya kurdî bi awayekî siyasî bê çareserkirin, her diçe berfireh dibe.

Ji bo piştgirî û alîkariya bi vê kampanyayê re hem li hundirê welêt û hem jî li derveyî welêt, bi beşdariya gel, rojiya birçîbûnê belav dibe.

**Li Tirkiyeyê**

Li Stenbol, İzmir, Edene û gelek bajarên din, bi pêşkêşiya lêzimên girtiyan û welatparêzan, rojiya birçîbûnê li gelek navçeyên HADEP'ê çêdibin. Li gorî agahiyên herî dawîn, li Edeneyê rewşa gelek jinên ku beşdarî rojiya birçîbûnê (18 tîrmeh) bûne, xerab e. Navê jinên ku bi dest me ketin ev in: Ayşe Çağan, Türkan Gön, Safiye Özer, Remziye Kısa, Gülistan Bulut, Elmas Işık, Zeliha Koç, Tevrat Yamaç, Zeliha Kandan, Şefika Kandan û Zeliha Ağaç. Ji hêla din li Edeneyê NÇM, bi skeç û muzîkê piştgiriyê dide kesên ku ketine rojiyê. Li Stenbol û İzmirê jî bi giranî li navendên HADEP'ê rojiya birçîbûnê tê organîzekirin. Hejmara beşdar û kesên ku van deran ziyaret dikin roj bi roj pir dibe.

**Li Kurdistanê**

Li Amedê, Meletê, Semsûrê û gelek bajarên din, rojiya birçîbûnê dewam dike. Li HADEP'a Amedê, Meletê û Semsûrê bi sedan lêzimên girtiyan û welatparêz, ji bo ku piştgiriyê bidin girtiyan, ketin vê kampanyayê. Li van bajaran sendîka û saziyên demokratîk jî di nav de, navendên HADEP'ê bi mêvanan mişt dibin.

**Li dinyayê**

Ji hêla din ji bo piştgiriya bi girtiyan re, li gelek dewletên dinyayê rojiyên birçîbûnê ji 20'ê tîrmehê ve dest pê kirin. Washington, Londra, Paris, Cenevre, Stockholm, Berlin, Moskova, Atina, Deen Haag û Frankfurt jî di nav de li gelek bajarên dinê bi hezaran kes ji bo piştgiriya girtiyên zîndanê beşdarî vê kampanyayê bûn. Li gorî agahiyên herî dawîn, gava rojname diket çapê, li Berlînê zêdeyî 200 kesî ketine rojiya birçîbûnê. Der barê bajarên din de tu agahî bi dest neketin.

**Mesajên destekê**

Ji bo piştgiriya, bi rojiya birçîbûnê re gelek saziyên kurdan mesajên destekê şandin. Li ser navê Parlementoya Kurdistanê ya li Derveyî Welêt, ji Serokê Konseya Kargeriyê Zübeyir Aydar û li ser navê Yekîtiya Azadiya Jinên Kurdistanê (YAJK) û Mala Kurd a Berlînê, mesajên piştgiriyê hatin şandin wan û diyar kirin ku ewê hemû rêxistin û saziyên dinyayê ji vê bûyerê agahdar bikin.

**Girtîgehên ku rojiya birçîbûnê lê heye:**

Diyarbekir Tîpa Taybet **1200**
Diyarbekir Merkez **40**
Diyarbekir Bismil **30**
Stenbol Bayrampaşa **600**
Bursa Tîpa Taybet **500**
Mêrdîn **500**
Mêrdîn Qoser **50**
Mêrdîn Dêrik **30**
Elezîz **250**
Êlih (Batman) **600**
Erzerûm Tîpa Taybet û Tîpa E **1200**
Konya Tîpa E **500**
Ankara Merkez **34**
Amasya **90**
Yozgat **170**
Çankırı **150**
Kayseri **20**
Nevşehir **35**
Sakarya **16**
Urfa Tîpa E (jin) **17**
Urfa Sirûc **3**
Sêwas Tîpa Taybet (jin) **60**
İskenderûn Tîpa E **300**
Edene Ceyhan Tîpa Taybet **200**
Mereş Elbîstan Tîpa E **200**
Adıyaman Tîpa E **100**
Meletî **120**
Dîlûk (Entab) Tîpa Taybet **490**
İzmir Buca Tîpa Taybet **300**
Aydın Tîpa Taybet **120**

Li hêla din ji Çanakale, Bartın, Kütahya, Manisa, Muğla, Kırşehir, Gebzeya Sakaryayê, Kırklareli, Ermeneka Konya, Hekarî, Wan, Nazilliya Manisa, Bilîs, Gölbaşiya Adıyamanê, Mûş, Mereş, Niğde, Sêrt, Qars, Zileya Tokatê, Bazîdê jî rojiya birçîbûnê didome.

**Navenda Nûçeyan**



Serokê HADEP'a Êlihê (Batmanê) M.Salih Altun ji bo Welatê Me peyivî:

# 'Em naxwazin gelê me koçber bibe'

**Altun: "Îro aboriya Tirkiyeyê ji ber domandina vî şerî tarûmar bûye, siyaseta dewletê xitimiye, tu qedr û qîmeta wan li dijî dewletên Rojava nemaye. Îro pereyên ku li vî şerî diçin ji nîvê butçeya Tirkiyê zêdetir e. Ev pere ji bêrîka gelê kurd û tirk derdikeve, dibe top, tiving, gule û tanq dizîvire li wan dikeve."**

**Beriya pirsan em dixwazin we bi kurtayî nas bikin**

–Ez di sala 1966'an de li gundê Reşikê ku girêdayê navenda Êlihê ye hatime dinyayê. Piştî tevgera 12'ê rezberê (îlon) em mecbûr man ji gund derketin, hatin Êlihê. Ez ji malbateke kedkar têm. Demeke direj di rojnameya Yeni Ülke û Özgür Gündemê de xebitîm. Bi avakirina DEP'ê (Partiya Demokrasî) ez bûm Serokê DEP'ê. Vê gavê jî ez Serokê HADEP'a Êlihê me.

**Li Êlihê rewşa şoreşgerî, welatparêziya gel û têkoşîna doh çawa bû, îro çawa ye?**

– Êlih ji aliyê welatparêzî û şoreşgeriyê ve doh jî û îro jî nav daye û hê jî nav dide. Ji ber ku Êlih di navenda Kurdistanê de ye, ji her aliyê welat tesîra welatparêziyê, tesîra çandê, tesîra zimanê fesîh li ser kom bûye. Gelê Êlihê (Batman) tu caran nexwestiye bikeve bin destê zaliman, li dijî neheqiyê rabûye, ji ber vê jî bûye hedefa êrîşan. Gelek kesên welatparêz û şoreşger ji Êlihê derketine. Yek ji wan şexsiyetan jî Edip Solmaz e. Di sala 1979'an de gelê Êlihê di hilbijartinên Serokê Şaristan e (belediye) de bi ray (deng) ên tevanî zef Edip Solmaz wekî endamê serbixwe hilbijart. Edip Solmaz ji hêla gelê Batmanê ve, li ser navê welatparêzî û şoreşgeriyê hatibû hilbijartin hêzên tarî, ew kuştin. Armanca wan kesê tarî di şexsiyeta Edîp Solmaz de cezakirina gelê kurd bû. Lê belê ew kes tu caran negihiştin armanca xwe. Li Êlihê ji wê rojê heta îro bi hezaran Edip Solmaz derketine.

**Wekî hûn jî zanin jiyana Êlihê (Batman) ji berê ve bi tekoşîn û serhildanan derbas bûye. Ev jî dibe sedema êrîşên dewletê û hinkesên tarî, li ser kesên welatparêz û şoreşger. Hûn vê yekê çawa dibînin û bi çi awayî dinirxînin?**

–Wekî ku me pêşî jî got; ji aliyê welatpareziyê ve di nav Êlihê de potansiyeleke zehf xurt heye. Lê belê dewlet ji salên 1970'yî heta salên 1990'an xwest ku şexsiyetên li dijî şoreşgeriyê derxe holê. Piştî derketina van şexsiyetan, kuştin dest pêk kir. Ji sala 1991'an heta vê gavê tenê li navenda Êlihê zêdetirî 800 kesên welatparêz hatine kuştin. Piştî ku mirov van hêjmarên sosret tîne ziman, girîngiya Êlihê jî derdikeve holê. Lê belê em bextewar û kêfxweş in ku piştî van kuştin û cinayetan tu carî gelê Êlihê teslîm nebûye û nabe jî.

Sedema van êrîşên dijmirovî ev e ku; gelê kurd were tirsandin û çewsandin. Ev armanc di pirtûka kontra Ahmet Cem Ersever de zehf vekirî xuya dike, A.Cem Ersever wiha dibêje: "Dema zarok û rêberên gel yeko yeko bên kuştin wê gel bitirse, biçewse. Wê çaxê gel wê paş bikeve. Ev jî serkeftinek e" Lê belê piştî van êrîşan jî gelê me nehatiye pelişandin. Piştgiriya wan her diçe ji bo hev xurt dibe. Hûn jî zanin ku greva birçîbûnê ya ku ji bo girtiyên zindanan li HADEP'ê çêbûbû, bi hezaran kes hatin serdanê. Birêz Murat Bozlak jî bi 400 erebeyan ji Amedê hatibû Êlihê.

**Wekî hûn jî dizanin îro li Kurdistanê şerekî kirêt û bêqaîde didome. Der heqê vî şerî de hûn çi difikirin?**

– Îro aboriya Tirkiyeyê ji ber domandina vî şerî tarûmar bûye, siyaseta dewletê xitimiye, tu qedr û qîmeta wan li bal dewletên Rojava nemaye. Îro pereyên ku li vî şerî diçin ji nîvê butçeya Tirkiyê zêdetir e. Ev pere ji bêrîka gelê kurd û tirk derdikeve, dibe top, tiving, gule û tanq dizîvire li wan dikeve. Çima û ji bo çi? Zarokên gelên kurd û tirk ên belengaz û perîşan li çiyayên Gabar, Cûdî, Herekol û Amanosan werin kuştin, winda bibin û esîr bikevin û çima kurê Serokwezîra Tirkiyeyê Tansu Çillerê li cem Qesra dîya xwe, li ser behrê leşkeriyê bike. Ne qebûlkirina me ev e. Em radibin û rûdinin van rastyan dibêjin, ji ber vê jî em dibin hedefên êrîşan. Lê belê yê ku me li ser lingan dihêle gelê kurd û gelê tirk e.

**Em werin ser êrîşên ku li ser we dom dikin. Ji HEP'ê heta vê gavê we çend şehîd dane. Tu gotinên we ji wan qatîlan re hene an na?**

–Ji HEP'ê (DEP jî di nav de) heta vê gavê hejmarên şehîdên me ku wesfa rayedariyê li ser wan hebû 104: (Xalê Ezedîn li Edenê hate kuş-

www.arsivakurdi.org

## JÛJÎ

Doğan Güzel




tin wekî şehîdê 105'an) tenê me li Êlihê (Batman) mebûsek (M. Sincar), 12 rayedar û bi sedan zêdetir endam û alîgir di vê rê de şehîd dane. Jixwe kontirgerîla ji bo HADEP'ê û ji bo qirkirina gelê kurd, Êlih wekî "Herêma pîlot" îlan kiriye. Lê belê em piştî her şehîdê xwe ala li berxwedanê bilindtir dikin.

Em ji wan qatîlan re û dibêjin: "Madem hûn ewçend ji me aciz in û ji bo îmhakirina me çi ji destê we tê hûn dikin, çima hûn di platformên siyasî de li dijî me dernakevin?" Lê belê em vê yekê baş dizanin di mejiyên wan kesan de piçek aqil tune ku di platformên siyasî de werin hemberî me û ne jî ziravê wan heye ku bêjin me hûn kuştine. Ji navê wan jî tê famkirin ku ew kes tarî ne, lê belê em ronî û roj in.

**Hûn çi dikin û çi dixwazin ku hûn tên kuştin?**

– HEP, DEP û îro jî HADEP piştî ku ava dibin, jiyaneke birûmet didomînin. Ev her 3 partî jî vê ku sîstema îro li holê ye û em jê re dibêjin: "Sîstema Durûtiyê" red dikin. Armanc û têkoşîna me ji bo bicihbûna demokrasî û mafên mirovan e. Em polîtîkayên rojane nakin, em tespîtên demdirêj dikin, pirsgirekên gelên kurd derdixin holê û projeyên musbet datînin ber gelê xwe, hedefa me iktîdara gel e. Lê belê sîstem dixwaze me bike cerdevanê rejîmê. Bêguman em vê yekê tu car qebûl nakin.

Emê wekî herdem îro û sibê jî, ji bo ku laîqî şehîdên xwe bin, bixebitin. Ji bo têkoşîna gelê xwe çi ji destê me were, di dawiyê de mirin jî hebe, emê bikin. We got hûn çi dixwazin; em aştî, biratî û wekheviyê dixwazin. Em naxwazin gelê me koçber bibe, gundê wan bişewite, xera bibe, em naxwazin cinayetên failî–meçhûl, înfazên sikakan çêbibin, bi kurtayî em naxwazin însaniyet bikeve bin lingan û postalan. Heger bedela van tiştan kuştin be, girtin be, revandin be jî em bêdeng namînin. Em zanin ku "bêdengî şirîkatiya sûc e." Ji ber vê yekê jî em li dijî van êrîş û talûkeyan amade ne.



**Gelê kurd li HADEP'an tevgirêdanên xwe çedikin.**

**Îro ku hilbijartineke azad û wekhev, ku îradeya gel temsîl dike çêbibe hûnê li Êlihê bi ser bikevin an na. Şensê we çi ye?**

– Ne tenê li Êlihê, li her deverê Kurdistanê (bakur) ku hilbijartineke azad û wekhev çêbibe, tu partî nikarin bibin alternatîfa me. Qeweta me li holê ye. Di hilbijartinên sala 1991'an de gelê me li herêmê ji %80 li dijî wan partiyên durû, rayên xwe dane HEP'ê, 3 mebûs bi îradeya gel hatine hilbijartin. Herdem em van rayên xwe muhafeze dikin, ji ber ku rayên me bloke ne. Gelê me di sala 93'an di 27'ê adarê de jî îradeya xwe bi "boykot"ê nîşan da. HADEP di vê hilbijartinê de bû partiya boykotê û partiya boykotê jî ji %40 ray stand. Îro Reîsê Şaristana (belediye) Êlihê ku ji Partiya Refahê ye îradeya gel temsîl nake, ji ber ku ji 65 hezar dengdêran încax rayê 14 hezar kesî standiye. 27 hezar kesî hilbijartin boykot kiriye û neçûye ser sandoqan. Ev encam li her derê Kurdistanê heye. Serokên belediyeyên bajar û navçeyên Kurdistanê îro bûne qeşmerên Waliyê Rêveberiya Taybetî Ünal Erkan. Tu ferqa wan û qumandarên xwenizanan tune ye. Îca, ew kes wê çawa îradeya gelê kurd temsîl bikin?

Îro ku em bikevin hilbijartineke azad û wekhev bi hindikayî emê ji %75 ray (deng) bistînin. Ne em tenê van tespîtan dikin. Kesên ku gelê me dikujin û gundên me dişewitînin jî van tespîtan dikin. Yek ji wan jî Serokê Artêşê ye. Di lêkolîna genelkurmayê de tê gotin ku di hilbijartineke wiha (azad û wekhev) de wê HADEP li deverên mîna Amed, Êlih, Mêrdîn û Sêrtê ji %80 ray (deng) bistîne.

**Ji bo agahdariyên we pir spas.**

–Ez li ser navê rêxistina HADEP'a Êlihê ji Welatê Me re spas dikim. Ji xebatkar û xwendevanên we re silavên şoreşgerî pêşkêş dikim.

**HEVPEYVÎN: SALIHÊ KEVIRBIRÎ**

## ...KURTENÛÇE...

### Sinn Fein'ê destek da PKK'ê

Partiya Sinn Feinê ku wekî şaxê Artêşa Îrlandayê tê hesibandin piştgirî da rojiya birçîbûna ya dîlên PKK'yî. Li ser navê Sinn Fein'ê Martin Me Guiness derbarê vê meseleyê de beyanatek da. Di beyanatê de li gel piştgiriyê, bangî medyayê jî kir.

### PKD li Rûsyayê

Heyeta Parlementoya Kurdistanê ya li Derveyî Welêt (PKD) ji bo hevdîtin û têkiliyan çû Rûsyayê. Heyeta PKD'ê, di 19'ê tîrmehê de li parlementoya Rûsyayê, bi nûnerên di meclîsê de, hevdîtin, çêkirin. Serokê Konseya Kargeriyê Zübeyir Aydar, Mebûs Rustem Broyî û Mebûs Şeref Asuryan, li ser navê PDK'ê beşdarî civînan

### Li Tirkiyeyê îşkence bûye meslek

Lijneya Şêwra Bilind a Mafên Mirovan, li ser daxwaza Serokwezir Tansu Çillerê, bi navê "Pirsîna Nûjen û Şertên wê" raporek amade kir û ew pêşkêşî Tansû Çillerê kir. Di raporê de tê gotin ku îşkence bûye wekî "adetekî meslekî"

### Adresa şerê başûr: PDK û YNK

Şerê PDK'ê û YNK'ê, di nav hefteya borîn de li derdora Hewlêr, Selahaddîn û Rewandizê qewimî. Herdu hêz jî, hevûdin tewanbar dikin. Di van şerên dawîn de, li gorî agahiyan, zêdeyî 300 kesî hatiye kuştin.

### Yaşar Kaya çû Amerîkayê

Serokê Parlementoya Kurdistanê ya li Derveyî Welêt PKD'ê Yaşar Kaya, ji bo ku beşdarî Kongreya (21–23'yê tîrmehê) Neteweyî ya Kurd li Bakurê Amerikayê bibe, çû Kaliforniyayê. Kaya, wê li ser azadiya çapemeniyê û demokrasiya li Tirkiyeyê axafatinekê bike. Kongreya Neteweyî ya Kurd cara 8'an civîna xwe çêdike..

### Li gundên Hekariyê 22 cerdevan mirin

Gerîlayên ARGK'ê di 20'ê tîrmehê de girtin ser gundê cerdevanan. 22 cerdevan mirin, 23 heb birîndar bûn û gerîlayan 13 heb jî bi xwe re birin. Bûyer, li gundê Etroşa (Uzundere) Çukurca û Kayadîbiyê ku herdu jî li ser bajarê Hekariyê ne, qewimî.

www.arsivakurd.org

Navê **5** kesên ku di xaçepirsa hejmara 33–34'an de peyva veşarî **'Şeva çaran'** dîtine û pirtûka **"Mişk û Mirov"** ya John Steinbeck qezenc kirine:

**Zozan Erbeyi**
**Qoser / Mêrdîn**

Alpaslan Elçi
Denizli

**Welat Yavuz**
**Kuşadası**

İbrahim Coşkun
İzmir

**Dîlaver Döver**
**Amed**

# 'Ji bo aştiyê dest bidin hev, bila xwîn bisekine'

Ev slogan ya kampanyaya aştiyê li hemberî şer e. Di 18'ê tîrmehê de li Stenbolê, li ser navê sazî û şexsên rewşenbîr, hunermend, nivîskar, rojnamevanan, û 70 kesî dest bi kampanyaya "Ji bo aştiyê dest bidin hev, bila xwîn bisekine" kirin.

Der barê kampanyayê de, Sekreterê Giştî yê Weqfa Maf û Azadiyên Kurdan Yılmaz Çamlıbel ev got: "Ciwanên me dimirin, ekonomî tahrîb dibe, ekolojî û suruşt xera bûye û em gelek êş û derdan dikşînin. Mesûliyeta me li hemberî civak û malbatên me hene û ji bo vê yekê me dest bi kampanyaya aştiyê kir." Çamlıbel, bal kişand ser dehsaliya şer û êşên wê. Li gorî wî ji berê ve mucadeleya "aştiyê" wekî sûc hatiye dîtin û wer hatiye xuyakirin ku ew kesên bi aştiyê re eleqedar dibin, "xayîn" in.



**Çamlıbel: "Ciwanên me dimrin, ekonomî tahrîb dibe, ekolojî û sunuşt xera bûye û em gelek êş û derdan dikşînin."**

Daxuyaniya Aştiyê ji aliyê 70 kes û nûnerên saziyan (Mebûsê Partiya Yekîtiya Keskan 90 Cem Özdemir–Almanya, Mebûsê Şirnexê Mahmut Alınak, Hunermend Şanar Yurdatapan, Orhan Aydın, Halil Ergün Nivîskar Cezmî Ersöz, Alîkarê Serokê Komeleya Mafên Mirovan (İHD) Ercan Kanar, Serokê HADEP'a Stenbolê Dr. Kemal Parlak, ji Weqfa Yılmaz Güney Fatoş Güney, Seroka Tüm Bel–Sen Vijdan Baykara, Însiyatifa Aştiyê, Komeleya Hemwelatiyên Helsînkî, Komeleya Pir Sultan Abdal, Komeleya Hevkarî û Kulturê ya Dersimê, Enstîtuya Kurdî, Partiya Guherîn û Demokrasiyê (DDP), DİSK, Sendîkayên Memûran yên Diyarbekirê, Weqfa Maf û Azadiyên Kurdan, Mazlum–Der, Platforma Jinan a 8'ê Adarê û gelek komele û rêxistinên demokratîk ve hatibû îmzekirin.

Ev daxuyanî, ji aliyê Nivîskar Cezmi Ersöz ve li Salona Yekîtiya Hekîmên Tirk (TTB) hate xwendin. Di daxuyaniyê de hate diyarkirin ku rojê 1 trîlyon mesref li şer diçe û ev bar li pişta kedkaran siwar dibe. Daxuyanî wiha didome: "Dewlet rê li ber daxwazên derdorên dijber digire û li hemberî meseleya kurdan, ji bilî şidetê tu rê û metodê bi kar nayne. Ew kesên ku van daxwazan dikin jî, ji aliyê rayedarên dewletê ve wekî 'xayîn' têne dîtin."


Di daxuyaniyê de li ser sekinandina şer hate gotin ku: "Problem bi şer û şidetê çareser nabe, li gorî me divê ew bi guftûgoyên demokratîk bên halkirin. Ji bo vê yekê em bawer in ku ev problem, bi derdorên mîlîtarîst nayê çareserkirin û em dixwazin ji bo aştiyê dest bidin hev. Werin em bi hev re dengê aştiyê bilind bikin."

Di dawiya civîna çapemeniyê de afîşek ku li ser wêneyê leşkerek û gerîlayekî hebû û bi slogana "Ji bo aştiyê dest bidin hev, bila xwîn bisekine." ji aliyê Yılmaz Çamlıbel ve hate pêşkêş kirin û Çamlıbel ji bo beşdariya kampanyayê, bangî raya giştî kir.

**Navenda Nûçeyan**




## XAÇEPIRSA BIXELAT (36)




Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, em dinirxînin. Xelat bi riya pişkê (kura) li 5 kesan tên belavkirin. Xelata hejmara 36'an; kaseta **Metin – Kemal Kahraman " Deniz Koydum Adını"** ye.


**Jêrenot:**
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

**Xelata Xaçepirsê**




**Kapaxa "Deniz Koydum Adını"**

www.arsivakurdi.org



Meles Zanawi

# Etopya wê bibe mînakeke baş an xerab?

Rêxistina Eniya Demokratîk a Şoreşa Gelê Etopyayê piştî şerekî 17 salî li hemberî rejîma Mengistu Haile Mariam, di gulana 1991'î de hate ser kar. Serokê vê rêxistinê Meles Zenawî li wî welatê ku lê 80 qewmên cur bi cur dijîn, dest bi demokrasiyeke berfireh kir. Qanûna bingehîn a ku di gulanê de hate pejirandin, welat li gorî qewman wekî 9 herêmên xweser dabeş dike. Hinek ji wan bi tenê ji qewmekî pêk tên. Hinekên wekî paytext Addis Ababayê jî mîna herêma pir–qewmî hatine terxankirin. Li gerqanûnê wê herêm di warê tenduristî, perwerdehî û bacê xwediyê rayayên berfirehtir bin. Dîsa qanûn rayayê dide her herêmê ku bi dengê piraniya gel ji Etopyayê veqete. Di sala 1993'yan de Eritre bi biryareke bi vî rengî veqetî. Hin kes dibêjin ku ew ceribandin wê ji bo Afrîkayê bibe mînakeke baş. Hin kes li hemberî vê qanûnê derdikevin û dibêjin ku hev biryar wê êl û eşîrên Etopyayê ji hev bi dûr bixe. Li vî welatî 30 sal bi şerê navxweyî û di nav xila û bêewletiyê de, derbas bûye. Tê tirsîn ku ev tişt bi vê sîstemê xwe dubare bike.

Serokê Partiya Neteweyî ya Demokratîk ya Etopyayê Nebiyu Samuel dibêje: "Cinê etnîkî ji şûşe hatiye derxistin." Divê bê gotin ku piraniya kesên ku sîstemê rexne dikin, ji qewmê Amhara ne. Ew qewm ji sedî 25'ê nifûsa Etopyayê pêk tîne. Wan berî 1991'î serdestiya 55 milyon mirovên etopyayî dikir. Piştî 1991'î hêz li hemû qewmên din hate dabeşkirin. Tê gotin ku zivêriya wan ji ber vê yekê ye. Dîplomatekî Rojavayî dibêje: "Ji ber ku wan cihê xwe di nava civakê de winda kirin, ew bi hêrs in." Hinek mirov dibêjin ku bi taybetî li cihên çolterî nakokiya di navbera êl û eşîran de zêde dibe. Şoferekî taxsiyê ji Addis Ababa, bi navê xwe Weldeyes Abebe dibêje: "Niha heke hûn Amharayî bin, di nav herêma Oromia de bi çavê biyanan li wê dinihêrin."

Wekî astengiya sereke ya li ber yekitiyê xizanî û problemên civakî tê dîtin. Tevî pirsgirêkên wekî bêkarî, birînên ku şerê hindurîn lê vî welatî çêkirine jî, tê gotin ku rewşa Etopyayê ber bi başiyê ve diçe.

**Nûçeyên Derve**

# Fransayê sûcê xwe pejirand

**Ev 13 hezar mirov berî bikevin riya kampê Auschwitzê ji aliyê polîsên frensî ve li Stadyûma Vel d'Hiv hatibûn civandin. Pişt re naziyan ew şandibûn kampên mirinê û piraniya wan kesan hew zivirîbûn.**



Piraniya cihûyên ku ji seranserê dinyayê şandin kampên mirinê hew vegerîn.



Jacques Chirac

Serokê Fransayê Jacques Chirac roja 16'ê tîrmehê di civîna bîranîna cihûyên frensî de, sûc û pişikdariya dewleta xwe pejirand. Rejîma hevkarê naziyan a Fransayê di 16'ê tîrmeha 1942'yan de 13 hezar cihûyên frensî radestî naziyan kiribûn û wan jî ew şandibûn baregehê (kampê) mirinê. Ev 13 hezar mirov berî bikevin riya kampê Auschwitzê ji aliyê polîsên frensî ve li Stadyûma Vel d'Hiv hatibûn civandin. Pişt re naziyan ew şandibûn kampên mirinê û piraniya wan kesan hew zivirîbûn. Chirac li ser vê yekê got ku dewleta wan jî di vî karî de pişikdariya naziyan kiriye, rûyê gelê Fransayê li hemberî dîrok û mirovahiyê reş kiriye. Wî got: "Vê demê rûreşiyeke mezin xist ser rabirdûya me. Her wiha ew bû sedema şikênandina tore û rêwişta me jî.."

Ev daxuyanî bû sedema dilxweşiya serokên cihûyan, ji ber ku heta niha Serokê berê Francios Mitterrand jî tê de, rayedarên frensî, berpirsiya vî karî nepejirandibûn û gotibûn: "Gelê Fransayê mirov nikare ji tawanên rejîma Vichy mesûl bigire." Chirac got: "Welatê Ronahî û mafên mirovan, xaka ku hembêza xwe ji penaberan re vekiriye, karekî wiha pir xerab kir. Ew kesên di bin parêziya xwe de radestî kujyaran kirin" Serokê Fransayê Jacques Chirac axaftina xwe wiha domand:" Pejirandina hin çewtiyên dewletê di demên tarî de û kêmasiyên berê, riya herî serate ya parastina ramana azadî û rûmeta mirovahiyê ye."



Zarokên cihûyan ev roj ji bîr nekirine.




1995 DALE STEPHANOS (Ji Newsweek'ê)

Li ser axaftina Chirac, Serokê Komeleya Zarokên Cihûyên ku ji fransayê hatine derxistin, Ebûqat Serge Klarsfeld da zanîn ku wan her tiştê dixwestin bibihîzin, ji devê Chirac bihîstine. Wî got: "Binêrin hema çend salan berî niha bi tenê rayedarekî ji rêzê beşdarî civînên me yên bîranînê dibû." Klarsfeld got ku dewletê piştî radestkirina cihûyan, dest daniye ser malê wan jî û ew kiriye malê xezîneyê. Wî xwest ku zirara wan kasan jî bê telafîkirin. Her wiha Serokê Kongreya Cihûyên Ewrûpayê Jean Kahn dilşahiya xwe nîşan da.

Her çiqas raporên rêxistinên mafên mirovan wekî Rêxsitina Efûyê balê bikişînin ser bilindbûna pejnên nijadperestî li Fransayê û tiştên ku ev dewlet tîne mirovên biyan, penaber jî, derdorên siyasî vê axaftinê wekî pêşketinekê dinirxînin. Derdorên pêşverû jî balê dikişînin ser rewşa ku cihû niha tê de ne. Ev dibêjin ku cihûyên siyonîst zilmeke giran li mirovên filistînî dikin û lobiya cihûyan di qadên navneteweyî de piştgiriya zaliman dike.

**Nûçeyên Derve**

# FAL

**BERAN (21 Adar – 20 Avrêl)**

Li gorî hin kesan hûn zehf bêhnfireh in. Ew bi gotina, "Bêhnfirehî ji qelsiyê ye" dixapin û bi ser ve tên. Divê hûn bi wan bidin zanîn ku hûn di rewşên herî xerab de jî liberxwedanên bêhempa pêk bînin. Nexwe wê serê we gelek biêşe.

**GA (21 Avrêl – 21 Gulan)**

Tê gotin ku hebek kuncî ji dest we narije. Hûn bi hûrbînî karê xwe dikin. Tiştê herî bêkêr jî, dibe xwediyê fonksiyonekê, di destê we de. Lê mixabin hûn qet guh nadin siheta xwe. Heke wiha here, hûn demeke dirêj nikarin li ser piyan bimînin.

**CÊWÎ (22 Gulan – 21 Pûşper)**

Jiyana we li dûv gotina, "Ceribandin ji neceribandinê çêtir e" dimeşe. Heke hûn li ser vê rê bimeşin, hûn ji belayan xelas nabin. Rojekê berî rojekê xwe ji dostaniya hin kesan bi dûr bixin, nexwe wê mirina we ji gelek tiştan balkêştir be.

**KEVJAL (22 Pûşper – 23 Tirmeh)**

We bi helwesta xwe gelek mirov kirine xudan mal. Wekî dibêjin, "Cîranê xerab mirovan dike xwedî mal." Hûn jî dema yek tiştekî ji we dixwaze, awireke wisa didinê ku ew neçar dimîne, biçe ji xwe re wî tiştî bistîne.

**ŞÊR (24 Tirmeh – 23 Gelawêj)**

Her wekî dibêjin, "Hevalê qijikê nikul bi gû ye." Mirovên bi we re hevaltiyê dikin jî xwe neçar dibînin ku li gorî daxwaza we hereket bikin. Ev tişt wan dixe rewşên zehf komîk. Heke ew bi vê rewşa xwe bihesin, kes nikare we ji destê wan xelas bike.

**SIMBIL (24 Gelawêj – 23 Rezber)**

Li gorî we "Her tişt xweş e, lê di wexta xwe de." Lewra dema yek karê xwe di wextê de neke, li ba we tu hêjayiya wî/ê û karê ku ew dike namîne. Ev tiştekî baş e, lê hin caran divê hûn mirovan efû bikin.

**MÊZÎN (24 Rezber – 23 Kewçêr)**

Bi dîtina we, "Çavê tirsiyayî, xwelî zû dikevê." Ji ber vê yekê hin caran dinya xera bibe jî, hûn qet xwe tevnadin. Lê hin caran jî tirseke wisa dikeve dilê we ku hûn nema xwe radigirin. Mirov li hemberî vê bêyeksaniya we metel dimîne.

**DÛPIŞK (24 Kewçêr – 22 Sermawez)**

Hûn li hemberî kesên nexweş û pîr pir dilovan in. Her wiha heke yek zirarê bigihîne we, ew ji dest we xelas nabe. Hûn ji kesên ku, "Daran dikutin qula mozan" qet hez nakin. Ji bîr nekin ku hin caran hûn jî eynî tiştî dikin.

**KEVAN (23 Sermawez – 21 Berfanbar)**

Çawa ku dibêjin, "Dem siya darê ye" ji bo we jî tiştê derbasbûyî divê bê jibîrkirin. Dema hûn dibînin ku yek li dû tolhildana bûyereke kevin e, hûn şaş dibin. Lê her kes wekî we tiştan zû ji bîr nake, bila haya we ji vê yekê hebe.

**KARIK (22 Berfanbar – 20 Rêbendan)**

Hin kes wisa dizanin ku "Dinya tevde bişewite, gurzek gihayê we naşewite." Lê ev dîtin ne rast e. Ji ber ku hûn bi awayekî nependî dest diavêjin bûyeran û mirovan ji tengasiyan rizgar dikin. Hinekî xwe binimînin.

**DEWLIK (21 Rêbendan – 11 Reşemî)**

Hûn di axaftina xwe de peyva "Heval" pir bi kar tînin. Hin kes ji vê gotina we pirr zivêr bûne, bila haya we jê hebe. Baweriya gelek mirovan bi we nîn e. Ew dibêjin, "Fira mirîşkê heta kadînê ye." Li gorî wan; hûnê piştî demekê dev ji her tiştî berdin.

**MASÎ (20 Reşemî – 20 Adar)**

Hûn aliyê jiyanê yên kirêt jî baş dizanin, bes hûn zêdetir aliyê baş derdixin pêş. Ev ji dilpakiya we tê, lê hin kes vê yekê nabînin û dixwazin bi we bilîzin. Wê demê divê li hemberî wan dilxeraban desthildan pîroz be.

# Yê mêrxas bikuje lê mafê wî nexwe



Di salên 1930–1940'an de sînorê navbera Sûriyeyê û Tirkiyeyê evçend ne asê bû, çûn û hatina Sûriyeyê û Tirkiyeyê hêsan bû. Ango tixûb bêxwedî bû. Bi şev ereb dihatin cerd û diziya gundên nêzîkî sînor. Gundê Dala bi navçeya Nisêbînê ve girêdayî ye, nêzîkî tixûb e. Keyayê Dala Hecî Silêman li ber xetê, li binya Qubuka Cuhûyan nok çandibûn. Di despêka havînê de yekî ereb her roj xet derbas dikir, nok diçinîn, dixist şalika xwe û dibir Sûriyeyê.

Rojek, dudu, sisê..Hecî Silêman dibêje: "Wiha nabe," bi lez wan diçine, dixe gidîş. Ji yê ereb re xêra xwedê, nokên çinî hazir dike, ew jî şalika xwe dide ber dadigiret û dibe. Genim û cehê Hecî Silêman li ser bênderê bû, nikaribû bi nokan dakeve. Radibe nobedarekî datîne ber grdîşan. Dibêje, "Îro sibe emê wan bikşînin ser bênderê, ji diziya yê ereb xelas bibin".

Dîtira rojê ye ereb tê zeviya nokan, ser gidîşê dinihêre ku nobedar li ber gidîşê ye. Du sê şimaqan li paseban (nobedar) dixe û dibêje de were alîkariya min bike. Şalik baş dadigire û dibêje de hilde ser milê min. Yê nobedar qaşo çûye bergiriyê, ji yê ereb re dibe alîkar. Piştî ku yê ereb berê xwe dide binxetê diçe. Nobedar ji nû ve li gund dike hewar û gazî. Keya Hecî Silêman li hespa xew siwar dibe, bi pey yê ereb dikeve.

Li çola Nisêbînê, di binya Quba Cuhûyan re li ber xeta firensawî nêzîkayî li yê ereb dike, yê ereb destvala, Hecî Silêman, siwar bi rext û tifing bû. Hecî Silêman qîrek dide yê ereb û dibêje: "Ereb, ereb!"...Yê ereb şalê nokan ji nav milê xwe datîne, li Keya vedigere, dibêje:" Wica!" Keya dinhêre ku yê ereb ne di dirûvê mirovan de ye, melkemot e, ruhistîn e. Çav di nav serî de sor bûne, hovekî daristanê ye. Hema serê hespê vedigerîne ku bireve, canê xwe ji destê yê ereb xelas bike. Yê ereb êrîş dike ser, bi dêla hespê digire, biher û hêla ve diheliqîne, Hecî Silêman ji ser hespê dipengizîne, li erdê dikeve. Keya ji desthelaniyê dikeve. Yê ereb li hespê siwar dibe, ji keya re dibêje: "Kelb ibin kelb, şalê noka hilde ber min." Keya radibe şalê noka hildide ber yê ereb, li ser pişka hespa wî. Ereb bi oxira xwe de diçe. Keya jî pişta stûyê xwe dixwîne, peya vedigere gund. Gundî ji dipirsin: "Ka te çi kir, kanî hespa te?" Keya dibêje: "Lawo, wele ne ereb bû, melkemot bû, ruhistîn bû. Hespê min ji min stend, bir û çû. Lê li wî xweşhelal be. Mêran bikuje, lê mafê wan nexwe."

**Î. OMERÎ**

# Mamoste û xwendevan

Yê gundî bi xwe, ji ber ku bi tirkî nizane, radibe kurê xwe dişîne fêrgehê da ku fêrî zimanê tirkî bibe. Lê fêrbûna tirkî ne wisa bi hêsanî ye, bi kurik giran tê. Mamosta jî, rojekê hêrs dibe û du sê sîla li bin guhê wî dixe.

Kurik bi girî tê cem bavê xwe. Bavê kurik gelek hêrs dibe û dibêje. "Negirî kurê min, ezê aniha herim ser wî segbavî" û berê xwe dide fêrgehê, cem mamosta.

Hîna çend gavek ma bûn ku bigehê cem mamosta. Gava mamosta wî dibîne, bi ken ji yê gundî re wisa dibêje: "Halo, sen hoş geldin", Yê gundî jî wisa lê vedigerîne:

"Ez xoşgeldî, moşgeldî nizanim. Tu ka ji min re bibêje, te çima li kurê min xistiye? Yê mamosta dîsa bi ken û bi qerf "Halo, senin oğlun kucuktur" dibêje û hîna gotina wî dawî nehatiye yê gundî xwe dihavêjê û bi fêxêra wî digire û jê re dibêje "Segbav, bi ser de tu ji kurê min re dibêjî kuçik, kuçik senî benî gibidir."...

**BAVÊ EGÎD MAREM**

## XIŞXIŞ

Yek bi lezgînî hat û wiha got: "Qasî sed gurî wa ne, li palê dimeşin." Hesen got: "Na lo, ne ewqas in, rast bibêje birazê." Hiko bi gazin û qeseman bersiv da apê Hesen: "Bi Xwedê hey çil heb hebûn. Tu ji bo çi bawer nakî apê Hesen". Hesen dibêjê: "Rast bibêje Hiko, çil hebûn?"Hiko dibêje: "Ê hey deh heb hebûn... xişxişa wan bi qasî bîst heban bû."

Hesen kin birî: "Kuro birazê, de wele tuyê ji xişxişê jî werî xwarê!"

## ÇAVÊN XWE VEKE

Carekê du heb şervan li mala Ezo dibine mêvan. Dotira rojê Ezo û birayê wî yê mezin li ser erd dikevine gengeşiyan.

Ezo êrîşî ser birayê xwe dike û wiha dibêje: "Çavên xwe veke lawo, êdî ne wek berê ye, erê zarokên te pir in, lê min do êvarî dît ku ez jî ne bitenê me."

## KEWFIROŞ Û GUNDÎ

Yek li sûkê kewan difiroşe. Gundî li buhayê kewan dipirse. Kewfiroş: "Ev bi hezarî ne, evên din bi du hezaran in." Gundî: "Çima ew bi duhezaran e?" Kewfiroş: "Ev rind kedîkiriye, dema dixwîne hemû kewên biyan li wê dicivin." Gundî: "Yek ku bi qewmê xwe re ewqas xayîn be ji min re jî ne lazim e. Tu yeke bi hezarî bide min" dibêje.


**CÎHAN ROJ**

www.arsivakurd.org

# BANGAWAZIYA SEROKÊ GIŞTÎ YÊ PKK'Ê ABDULLAH ÖCALAN JI BO KURDÊN SOVYETÊ

Destpêk rûpel 16

Ji îro pê de karê herî çak ku wê bê kirin, terxankirina her tiştî ji bo xizmetkirina di ber jiyanê de ye. Ji bo xizmeteke wisa xwe amade bikin. Xwe nexapînin. Heta dawiyê bixebitin. Bidin ser hemû astengan. Heger hat û hinek jî we bi vî rengî rabin ser xwe, kiryareke we ya bi vî rengî, di ser her tiştî re ye. Ez dixwazim bidim xuyakirin ku hûn, mîna zarokan têne xapandin. Hûn zû bi girî vedibin. Li hemberî jiyanê hûn ne rijd (înad) û xweragirtî ne. Ev, lawaziya we ye, ne ya me ye. Êdî, vê bêçaretiya xwe bihêlin, hûn jî ji alozî û arîşeyan (problem) re bi çare bin. Li armancên mezin û pîroz xudan derkevin. Li dijî van armancan li dijî van daxwazan cih negirin.



### "Dema karkirinê ye"

Ji bo tevahiya dostên me yên li welêt, ji bo ewên ku dibêjin: "Dema karkirinê ye." Ji bo yên ku li dûv jêhatina xwe dixwazin tiştekî bikin em rê vedikin. Ev kêferata me hemû ji bo we ye. Di mêjûyê de cara yekê ye ku ev tiştana hemû pêk tên. Bawerî pêk tê. Cara yekê ye ku dijmin mîna berê nikare me tune bike. Cara yekê ye ku nikare di ser me re derbas bibe û me biperçiqîne. Cara yekê ye ku tûşî jiyaneke dem–demî û paşveçûnê bûye.

Helbet mirina dijmin, bi xebata gel ve girêdayî ye. Îro tevaya gel gihîştine hev. Bûne xudan armanc. Yekîtiya xwe damezrandin. Her kesekî cihê xwe di nav cengê de girtiye. Dinya hemû bibe yek jî êdî hew dikare werar (evrim) û pêşketina vî gelî rawestîne.

Heger heta bi îro PKK'ê kariye vê cengê berdewam bike, ew jî bi palpiştiya hêza gel e. Ji riya gel derneketiye. Ev jî, ji destpêkê ve wisa ye. Her ku diçe di nav gel de bingeha wê jî firehtir dibe. Cenga me, ber bi serkeftinê ve bêrawestan dihere. Dûrketina ji gel di cengê de sernigûniyê (têkçûnê) bi xwe re tîne. Ji ber vê yekê ye ku em her tim dibêjin: "Her tişt ji bo serkeftina gel e." Ango ev ceng, cenga gel e, ne tenê ya PKK'ê ye. Jixwe, ev ceng bes bi gerîla ser nagire. Her kesekî çi li derveyî welêt û çi li nav welêt hindek tiştan bike, wê ev ceng bigihê armanca xwe. Heger ev ceng bes bihêviya gerîla be, bi ser nakeve.

Bi vê cengê her wisa em mercên netewebûna xwe pêk tînin. Her wisa em jiyana xwe ya azad pêk tînin. Wê jiyana ku dijmin pêşkêşî me dike, ji gelek layan (aliyan) ve em ji holê radikin. Ev jiyana ku hê jî em dibînin, em naxwazin. Ji me re jiyaneke çawa divêt? Heger tu jiyana xwe li dûv mercên welêt amade bikî, nêrîneke welatperwerî bi kar bînî, li daxwaza azadiyê ya gel bixwedî derkevî, birêveçûna xwe, xebata xwe, rabûn û rûniştina xwe bixî xizmeta gel, wê hingê: "Ez jî xudan kesayetî me" tu dikarî bibêjî. Bêyî gel, "Ez jî xurt im, xudan şiyan (taqet) im" tu bibêjî ev derew e, xwexapandin e. Mirovên di nav me de jî, hemû dema bi vî rengî ne. Em dixwazin wan biguherin. Bêyî welat, dewlemendî nabe. Bêyî gel, ev pêk nayê. Hemû tişt bi hebûna welêt mezin dibe. Li dûv mezintiya hebûna te, buhayê te heye. Heger ev nebin dawiya te hatiye. Me divê hûn û gel bêne ser riya rastiyê.

### Bi rastiyên mezin nelîze

Cara yekê ye ku fersendeke wisa ji bo te hildikeve. Bê qeyd û şert tu jî bixebite. Xwe nexapîne. Bi zimandirêjiyeke erzan, bi pirsên erzan, bi rastiyên mezin nelîze. Berevaniyê (savunma) ji jiyana sexte re neke. Şêweyên bi vî rengî, ji xwe re neke rengê jiyanê. Van kiryarên nelirê bihêle. Ji hindek tiştên nelirê, bi zûtirîn wext, xwe riha (xelas) bike. Xwe ji hindek rastiyan re amade bike. Ez bixwe jî van tiştan re amade me. Bi rojan, bi mehan, bi salan ez dikarim bibêjim: "Rastî ev in, ev in, ev in..." û li ser van rastiyan bipeyîvim. Ez rastiyê ewqasî bingeh dibînim. Heger ev rastiya mezin nebûya, rastiya gel nebûya, ma serperiştî (serokatî) digihîşt vê rojê? Rastiya tevaya welêt nebûna, ma em wisa mezin dibûn? Em wisa bixurtî dibûn cihê axaftina tevaya cîhanê? Na xêr!. Heger rastiya mirovatiyê nebûna, li tevaya cîhanê me wisa nav û deng dida gelo? Na xêr!

**Cara yekê ye ku fersendeke wisa ji bo te heldikeve. Bê qeyd û şert tu jî bixebite. Xwe nexapîne. Bi ziman dirêjiyeke erzan, bi pirsên erzan, bi rastiyên mezin nelîze. Berevaniyê ji jiyana sexte re**

Bizava me ya azadiyê, di demeke tarî û perîşan de ku hemû tişt di xizmeta dijmin de bû, dest pê kir, mezin bû û em bi ser ketin. Pirsa "Çima em nakin?" ji xwe bipirsin û bersiva xwe bidin. Heger na, hûn nikarin xwe bi mirovan, bidin qebûlkirin ji bilî vê yekê, çi rêkên dîtir nîn in. Yan hûnê xwe bikin mirov, di şexsiyeta we de ev gotin, arasteyî (tewcîh) tevaya gelê me ye, yan jî ji nemanê hûn riha nabin. Min nevêt we biêşînim, lê bi rastî jî jiyaneke vala heye. Yan ji bo welat divêt hûn tiştekî bikin û li ser vê bingehê wê xizmetek hebe, yan jî, hûn nemane, dawiya we hatiye.

Ez vê gotinê, ji tevaya gel re dibêjim. Nêrîna min ya ji bo we ev e. Ji bo hevalan jî ez dibêjim. Dijmin karê xwe li ser pişta we bi rê ve dibe. Hûn nizanin şerê xwe, karê xwe bikin. Partî çi ye û alîkariya bi partiyê re bi çi rengî ye, hûn nizanin. Heger hûn vê yekê nizanibin, her wisa hûn jiyanê, hûn xwînê didin dijmin. Riya navîn tune ye. Yan riya nav dijmin, yan jî, riya nav partiyê heye. Riya navîn, riya herî bêrûmet e. Belê, ev dibe egereke jîndariya we. Ji hev balawela bûyî, hem li cem me, hem li cem dijmin "Ezê wisa bijîm" tu bibêjî ev ne durust e. Divêt êdî em dev ji vî exlaqî berdin.

### Bi bêhneke fireh me ev kar pêk anî

Riya ku me daye ser û em pê de diçin, hatiye îspatkirin ku riyeke rast û durust e. Hûn baş dizanin ku hindek tişt têne kirin. Îmkanên me berfireh dibin. Berî niha, du kurd nedihatin cem hev. Hemû li dijî hev bûn. Lê niha yekîtiya herî mezin hate damezrandin. Ji ser û binê Kurdistanê, heta bi kurdên ku li seranserî cîhanê belav bûne, me xwe gihande hemûyan û me hemû dîtin. Niha hemû piştevaniya vê siyaseta me dikin. Me karî rastiya mezin bi wan bidin xuyakirin û li pêş çavê wan raxînin. Heger ne bi vî rengî bûna, yekgirtina hewqas mirovan mumkûn nedibû. Me ev karê han, bi rêzanî kir. Bi bêhneke fireh û bi xizmetê, me ev kar pêk anî. Me kesek nexapand û me nehiştiye ku kes jî me bixapîne. Ya herî durust, bi vîneke mezin û li ser bingehê nerîneke mezin divêt xebat bête kirin, xebatek bi vî rengî dimeşe. Xebata durust, welatperweriya durust û azadiya durust ev e. Ev jî di xizmeta we hemûyan de ye. Ji bo bicihanîna vî karî hûn hemû dikarin bikin.

**Di dema Stalîn de, "Em bi KT'ê re têkiliyên xwe xurt bikin" hate gotin. Paşê, ji destpêkirina serhildanên kurdan û heta bi dawî (1925–1940) bi hemû hêza xwe li dijî kurdan hevkariyê pêk tînin.**

### Bila daxwazên we mezin bin

Bila jiyana we heder neçe. Hûn dikarin karên mezin bikin. Jiyana xwe wisa vala heder nekin, mixabin, gunehkariyeke mezin e. Bixebitin, bila daxwazên we mezin bin. Serkeftinên buhagiran bi dest xwe ve bînin. Xizmet, bêsînor e. Ango, mirov dilxwazekî ji dil be jî baş e, ev jî xizmet e. Heger mirov durust be, li dû şiyana xwe, jêhatina (îmkana) xwe, mirov dikare tiştinan bike. Li dûv daxwazê bi zanayî mirov dikare tiştina bike. Li dûv daxwazê, bi zanayî mirov dikare bike. Gava ku her kesek tiştekî bike, ev xebat wê bigihe armanca xwe. Hinek ji van kesan dibin serperişt (qumandar), dibin pêşewa, hinek leşker, hinek ji wan jî dibin siyasî. Belê, her hinek û tiştekî bikin. Ev cenga neteweyî ye, cenga gelêrî ye. Ya ku wê me bigihîne serkeftinê jî ev e. Ji bilî vê jî, tu xebatên dîtir, serkeftina welatê me pêk nayine.

Gelê kurd yê ku li hinek deverên Sovyeta berê bûn, bi taybetî jî yên ku li Qafqasyayê diman, gelekî dûrî me ketibûn. Ji sosyalîzma reel jî çi sûde (feyde) wernegirtibûn. Ez dikarim bibêjim ku ziyana herî mezin ji sosyalîzma reel, gelê kurd dîtiye. Hem li nav sovyetê, hem li derveyî sovyetê wisa bû. Vê jî hindek egerên xwe hene. Hûn baş dizanin, gava ku kemalîstên tirkan peyda bûn, ji bo dirêjkirina temenê sovyetê Lenîn xwest ku hinek têkiliyên taktîkî bi wan re deyne. Belê vê daxwazê, paşê ji sînorê taktîkî derbas kir. Di dema Stalîn de, "Em bi Komara Tirkiyeyê re têkiliyên xwe xurt bikin" hate gotin. Paşê, ji destpêkirina serhildanên kurdan û heta bi dawiyê (1925–1940) bi hemû hêza xwe li dijî kurdan hevkariyê pêk tînin. Vê hevkariya wan ziyaneke mezin gihande gelê kurd. Paşê li başûrê Kurdistanê serhildanekê dest pê kir.

Dîsa Sovyetê alîkarî bi qewmê ereb kir. Alîkariyeke mezin bi Sedam re kirin. Belê gelek kêmasî bi serperiştên kurdan re hebûn. Bi serperiştiyê re bertengî hebû. Lê pûte (îtibar) bi wan nehat kirin. Li dûv berjewendiyên rûsan danîna peywendiyan digel hindek dewletên ereban hêj çêtir bû. Her wisa alîkarî bi ereban re hate kirin. Sovyetê; li dûv berjewendiya xwe, siyaseta xwe bi rê ve dibir. Her wisa serhildanên Başûr jî hatin perçiqandin. Sovyetê xwest ku alîkariyê bi serhildana Mahabad re bike paşê ji bo berjewendiya xwe dest jê berda. Her wisa Mahabad jî ket. Her di vê navberê de dostaniya xwe digel Şah danîn. Li vêrê jî kurd sernigûn bûn (têk çûn).

### Danîna tekiliyekê digel kurdan

Di nav Sovyetê de serperiştiya Ezerbêcanê hinekî şovenîst bû. Ermenîstan û yên dîtir jî bi vî rengî bûn. Dixwestin berjewendiya qewmên xwe bi tenê biparêzin. Cih nedane kurdan. "Danîna tekiliyekê digel kurdan, bi berjewendiya me re nagonc e (li hev nake)" digotin. Di destpêkê de Lenîn, dixwest hinek tiştan bike. Her wisa Kurdistana Sor hate damezrandin. Hinek îmkan ji bo wan hate dan. Ji bo berjewendiyên xwe ev îmkan dane kurdan. Paşê ew jî standin.

**Wê bidome**

www.arsivakurd.org

## Komeleya Mafên Mirovan (İHD), piştî xebata 9 salan ber bi hedefên nû ve diçe

# JI BO DEWRA MAFÊN MIROVAN

- Serokê İHD'a Stenbolê Ebûqat Ercan Kanar: Em saziyeke wiha ne ku dewlet tehemulî me nake. Em bûne aboneyên mehkemeyan. Hem îdeolojiya resmî û hem jî medya desthilat, ji me aciz in.


- "Di dehsaliya İHD'ê de li gel her cur zehmetiyan, mirov dikare bi dilekî rehet bibeêje ku saziya me reşîdbûna xwe îsbat kiriye, hem li coxrafya me û hem jî di çav raya giştî ya dinyayê de wek saziyeke durust hate naskirin û her diçe di gel kêmasiyan, bêtir bala gel dikşîne ser xwe. Bi kurtî di 9 salan de mêjûyeke paqij û bi şeref li pey xwe hişt."

Hûn tu carî hatine girtin û we tu carî xwe bi tenê hîs kiriye? Belkî di binê hucreyekê an jî di cihekî tarî de, belkî jî di bin îşkenceyê de. Hûn hîç fikirîne ku gava dewlet neheqiyekê li we bike, wê kî alîkariyê bide we? Belkî jî di rewşeke wiha de îhtiyaca we bi peyveke piştgiriyê, hebe an jî hûn bixwazin haya we jî bigihîjê derekê ku hinek li we dipirsin. Erê, mirov dikare vê lîsteyê pir dirêj bike. Lê gelo kengî ev tişt têne bîra me gişan kú heta em bi xwe, nekevin vî halî? Li Tirkiyeyê belkî hîn jî haya bi milyonan kesî ji saziyeke ku bi van karan re eleqedar dibe, tune ye.

Komeleya Mafên Mirovan (İHD) ji bo ku rê li ber neheqiyan bigire, ew kesên ku mafên wan yên bingehîn tên îhlalkirin, biparêze û wan agahdar bike, bi gotineke din li hemberî her şikl neheqiyan di sala 1986'an de bi pêşkêşiya 98 kesan, di 17'ê tîrmehê de hate avakirin. Li Tirkiyeyê berî vê komeleyê di 1946 û di 1962'an de du komeleyên wiha hatibûn avakirin. Lê gava mirov li welatên dinyayê dinihêre, dibîne ku di vê meseleyê de jî derengiyek heye. Wek mînak li Frensayê ev kar di sala 1898'an de hatiye kirin.

İHD, li tevayê Tirkiyeyê û bajarên Kurdistanê tevgirêdana xwe bi 58 şûbeyan kiriye. Zêdeyî 15 hezar endamên wê hene. 1994'an Kongreya 32'yan, ya federesyona Navneteweyî ya Mafên Mirovan endamtiya İHD'ê qebûl kir. İHD, xebateke bêhnfireh û zehmet dike. Li dewleteke ku di 15 salan de 53 kes hatine îdamkirin, 70 hezar kes ji ber fikrên xwe hatine girtin û hîn jî tên mehkemekirin, 650 kes hatine îşkencekirin, 14 hezar kes ji hemwelatîbûnê hatine avêtin, 3 hezar kes di êrîşên tarî, failî mechûl de hatine kuştin, 39 hezar ton rojname, kovar û kitêb hatine şewitandin, hebûna gelekî (kurdan) hatibe înkarkirin, 5 milyon kes hatine û tên koçberkirin û her wekî din bi hezaran neheqiyên ku niha nehatine nivîsîn hebe, helbet wê karê komeleyeke wiha ne hêsan be. Welhasil, hinek kes li ser navê me û ji bo me (ji bo mirovahiyê) tiştan dikin, lê em di eynê xwe de dernaxin, ma ne wisa ye, ka em çi dikin?

**SUUT KILIÇ**



**Serokê şûbeya Stenbolê û alîkarê Serokê Giştî yê İHD'ê ebûqat Ercan Kanar**

**Komeleya me ji xeynî mudaxelekirina meseleyan, gava heqek bê îhlalkirin di cih de lêkolînê çêdike, raporên mehê û salê li gorî lokalî (herêmî) û globalîya meseleyê hazir dike û wezîfeya tesbît û teşhîrkirinê tîne cih. Di van xebatan de objektîf bûn, ji ajitasyona vala dûr li meseleyan nihêrîn, prensîbên me yên bingehîn in.**

İHD, dikeve dehsaliya xwe. Bi vê munasebetê, me xwest em nirxandina van salên borî û planên vê komeleyê ji bo paşerojê; hîn bibin. Bi serokê İHD'a Stenbolê û alîkarê serokê giştî Ebûqat Ercan Kanar re hevpeyvînekê bikin. Hevpeyvîn, li jêr e:

**Komeleya Mafên Mirovan (İHD) kengî, çawa û ji ber kîjan sebeban hate avakirin?**

–İHD, di sala 1986'an de, bi pêşkêşiya 98 hiqûqzan, nivîskar, doktor, muhendîs, lêzimên girtî û mehkuman, hate avakirin. Di dewra derbeya 12'ê rezberê (îlonê) de, di dema ku heq û hiqûq ji ortê hatibû rakirin û di warê jiyanê de rê li ber daxwazên maf û azadiyan hatibû girtin de, bi awayekî xwe bi xwe hate damezrandin. Her çû, sazîbûn ji xwe re kir hedef, siyaseta mafên mirovan net û zelal kir. Ne wekî avahiyeke wextî, heta îhlalkirina mafên mirovan hebe, ew jî hebûna xwe li gorî vê rastiyê organîze dike.

**Li Tirkiyeyê li welatekî ku mafên mirovan wekî tiştekî luks tê hesibandin, tewr, reaksiyon eleqeya gel û ya dewletê li hemberî we çi ye?**

–Em saziyeke wiha ne ku dewlet tehemulî me nake. Em bûne aboneyên mehkemeyan. Hem îdeolojiya resmî û hem jî medya desthilat ji me aciz in.

Em werin ser tewr û eleqeya gel: Ev tewr û reaksiyon, li gorî mijarê tê guherandin. Gava hinek tên acizkirin û tehdît li wan tê kirin, em jî aliyê wan kesên ku neheqî lê kirine ve, tên rexnekirin. Carînan jî em dikevin rewşa "Ne ji Îsa re û ne jî ji Musa re" Ev tişt jî normal e. Zaten sazî û rêxistinên ku mafên mirovan diparêzin her dikevin vî halî û ji ber vê yekê ye ku ew tu carî li gorî rewşê û feydeyên kes û saziyan hereket nakin; rastî çibe û di çi şertî de bin, li gorî mercên însanî hereket dikin.

Ku ne wiha bin, ji xwe layiqî fonksiyona xwe nabin. Siyaseta ku lazim e, biparêzin ev e: Li hemberî hemû şiklên îdaman derketin; li hemberî îşkence û zilmê, parastina herkesî; ji bo herkesî mehmkemekirineke adîlane xwestin û piştgirî ji bo parastina xwe. Di azadiya fikr û beweriyan de ji bo standardteke bê girtin kirina mucadeleyê; ji bo her gelî xwestin û parastina heqê teyînkirina qedera xwe; terefderbûna her cins gel û neteweyên ku zilmê dibîne, li aliyê din piştgirî û alîkarî bi her şexs û hindikahiyan re.

Di dehsaliya İHD'ê de li gel her cur zehmetiyan, mirov dikare bi dilekî rehet bibêje ku saziya me reşîdbûna xwe îsbat kiriye, hem li coxrafya me û hem jî di çav raya giştî ya dinyayê de wek saziyeke durust hate naskirin û her diçe di ☞

## Endamên İHD'ê yên ku ji aliyê hêzên tarî ve hatine kuştin

| | |
|---|---|
| Vedat Aydın | Endamê İHD'a Amedê |
| Sıdık Tan | Endamê İHD'a Êlihê (Batman) |
| İdris Özçelik | Endamê İHD'a Rihayê |
| Kemal Kılıç | Endamê İHD'a Rihayê |
| Orhan Karaağar | Endamê İHD'a Wanê |
| Cemal Akar | Endamê İHD'a Erzînganê |
| Cevat Gözdemir | Endamê İHD'a Tatvanê |
| Metin Can | Endamê Serokê İHD'a Elezîzê |
| Hasan Kaya | Endamê İHD'a Elezîzê |
| Muhsin Melik | Endamê İHD'a Rihayê |
| İkram Mihyaz | Endamê İHD'a İzmîrê |

Endamê İHD'a Amedê Vedat Aydın

www.arsivakurd.org

gel kêmasiyan, bêtir bala gel dikşîne ser xwe. Bi kurtî di 9 salan de mêjûyeke paqij û bi şeref li pey xwe hişt.

**Wekî tê zanîn dewlet pirî caran İHD'ê wekî terefder û hevkarê PKK'ê nîşan dide. Der barê vê meseleyê de fikrên we çi ne?**

–Di welatekî de kîjan sinif (çîn) zilmê bibîne, ew kesên heqê van diparêzin jî zilmê dibînin. Di welatekî de nasnameya gelekî bê înkarkirin, heqên wî yên neteweyî bên îhlalkirin û komele (İHD) jî di vê meseleyê de wezîfeya xwe bînin cih, car caran dibe ku sûcdariyên spekûlatîf ji aliyê derdorên li hember ve, bên kirin. Îro li şûna gelê kurd, gelekî din jî hebûya, me yê ew jî biparasta. Ji bo parastineke wiha dîsa me dikaribû ji aliyê wan derdoran ve bihatana sûcdarkirin. Lê sûcdariyên wiha ne rast in.

**Eleqeya gel li hemberî we çawa ye? Di vê hêlê de hûn zehmetiyan dikşînin an na?**

–Eleqeya gel ji komeleyê re her diçe bêhtir dibe. Her meh bi sedan serlêdanên ku ne siyasî ne, hene.

**Hûn gelek raporan hazir dikin. Gelo tesîra vê xebata we li hundur û li derve çawa ye? Wekî hûn ji dizanin tesîra saziyên ji hikûmetan azad, her diçe bêtir dibe. Di vê çarçeweyê de nirxandina we çi ye?**

– Komeleya me ji xeynî mudaxelekirina meseleyan, gava heqek bê îhlalkirin di cih de lêkolînê çêdike, raporên mehê û salê li gorî lokalî (herêmî) û globalîya meseleyê hazir dike û wezîfeya tesbît û teşhîrkirinê tîne cih. Di van xebatan de objektîf bûn, ji ajitasyona vala dûr li meseleyan nihêrîn, prensîbên me yên bingehîn in. Ji roja ku me komele damezrandiye û heta îro, ji bo van prensîbên me raporên ku em hazir dikin ji aliyê raya giştî ya navneteweyî ve wekî referans tên hesibandin. Di coxrafya ku em li ser dijîn de jî hêdî hêdî qîmeta van raporên me tê fêmkirin.

**Çima kurd eleqeyeke zêde nîşanî komelaya we didin.?**

–Eleqeya kurdan, tişkekî xwezahî (normal) ye. Dema li tarîxa cumhuriyetê bê nihêrîn, wê bê dîtin ku heta vê gavê tu saziyan qasî me li hemberî derew û çewtiyên îdeolojiya resmî derneketiye û qasî me dengê rastiyê bilind nekiriye; ermenî, rum, cihû (yahûdî), elewî, çerkez û suryaniyên ku li metropolan dijîn, eleqeyeke mezin, nîşanî komeleya me didin. Musulmanên ku heqên wan têne îhlalkirin jî serî li komeleya me didin.

Di vê çarçeveyê de li meseleyê bê nihêrîn, wê bê dîtin ku eleqeya gelê kurd (zimanê wî yê zikmakî jî hatiye qedexekirin) çiqas normal û di cih de ye.

**Ji bo pêş fikr û planên we hene, hûn çi difikirin?**

–Di pêvajoya li pêş me de, em difikirin û hewldidin ku ji aliyê bingeha teknîk ve sazîbûna xwe xurt bikin û ji aliyê pollîtîkayên xwe ve jî, ji bo firehkirin û kûrkirinê, em dixebitin. Di coxrafya me de problema herî mezin, bicihkirina aştiyê ye. Wezîfeyeke me ya din jî teşhîrkirin û rêlibergirtina kuştinên bêmehkemkirin, îşkence û tahdeyên din e. Ji bo wekheviya jin û mêran, ji bo mafên zarokan, ên hawîrdorê gelek çalakî li benda me ne. Dîsa ji bo azadiya tevgirêdanê ya sendîkabûnê jî xebatek li pêş me heye.

Di rojên pêş de ji bo aştiyê û li hemberî windakirina di bin çav de emê dest bi kampanyayan bikin. Li ser kesên ku di binçav de winda bûne, em haziriya kitêbekê dikin. Projeya me ji bo perwerdekirina mamosteyan di warê mafên mirovan de heye, li ser pirtûkên der barê gelek tiştên din de, belavok û dokumantên din, xebatên me hene.

Komeleya me, bi şeref 9 saliya xwe temam kiriye. Di pêş de em ji bo azadîbûna şexs û ya civakê dixebitin, ji dewletê, hikûmetan û partiyan azad, emê mafên bigehîn biparêzin û mucedeleya wan bikin.



## Li Stenbolê Komîsyonên İHD'ê

–Komîsyona Mafên Kulturê
–Komîsyona Mafên Zarokan
–Komîsyona Mafên Kurdan
–Komîsyona Jiyana Xebatê
–Komîsyona Girtîgehê
–Komîsyona Takîbkirina Îşkenceyê
–Komîsyona Hawîrdorê
–Komîsyona Jinan
–Komîsyona Hiqûqê
–Komîsyona Mafên Hindikahiyan

**Komîsyonên ku haziriya wan tên kirin**

–Komîsyona Koçberiyê
–Komîsyona Mafên Trafîkê
–Komîsyona Çapemeniyê
–Komîsyona Tekiliyên Navneteweyî

**Di nav İHD'ê de bi nav, kar û xebata xwe komîsyoneke cihêreng**

# Komîsyona mafên kurdan

Di nav vê saziyê de (şaxê Stenbolê) komîsyonek heye ku bi xebata xwe bal kişandiye ser xwe: Komîsyona Mafên Kurdan. Li ser xebata vê komîsyonê ême bi Selahattin Okçuoğlu, endamê İHD'a Stenbolê yê Lijneya Kargeriyê û Komisyona Mafên Kurdan re sohbetekê bikin.



**Selahattin Okçuoğlu**

**We çima îhtiyaca komisyoneke wiha dît?**

–Meseleya kurdan îro bûye navneteweyî, ji bo vê yekê İHD'ê wekî her meseleyê, eleqe nîşanî vê meseleyê jî da. Li komeleya me berê Komisyona Penaber Hindikahî û Mafên Neteweyî hebû û li wir meseleya kurdan dihat munaqeşekirin. Lê meseleya kurdan her roj, hîn bêhtir ket rojevê, ji bo vê yekê me îhtiyaca komîsyoneke din dît. Niha du komisyon (Komisyona Mafên Kurdan û Komisyona Mafên Hindikahiyan) hene û xebatê dikin.

**Heta îro faaliyetên we çi bûn, we çi kir?**

–Me bi civîneke çapemeniyê avabûna xwe diyarî rayagiştî kir. Sala çûyî, me bilaçoyên şer ji sê mehan carekê weşandin. Gelek carî li hemberî siyasetên asîmîlasyon û qirkirinê me beyanat dan çapemeniyê me panelek bi navê "Newroz, Helepçe û Koçberî" li dar xist. Dîsa li ser heman meseleyê pêşangeha resim û rêdana fîlman, li hin sendikayan civîn, rêdana vîdeo û faaliyetên muzîkê çêkirin. Vê dawiyê jî me Rapora Koçberiyê amade kir. Di nêzîk de wê ev raporên me tercumeyî zimanên din jî tên kirin. Tesîra van raporan li nav raya giştî ya dinyayê pir heye.

**Zehmetiyên we çi ne û hîç hûn bi qedexekirinê re rû bi rû man e?**

–Afîşa me ya bi navê "Dinyayeke bêşer, Newrozeke bêxwîn" hate qedexekirin. Helbet zahmetiyên me pir in. Meseleya me ya herî mezin, hindikbûna wexta endamên me ye, ji ber ku ew di karên xwe de dixebitin. Zahmetiya din jî ev e; em xwe nikarin bigihînin kurdan. Tirsa dehsalan, wan ji faaliyetên wiha bi dûr dixîne û ew xwe li quncikên vî metropolî vedişêrin.

Ew kesên ku nû tên bajêr, bi piranî xwedî psîkolojiyeke wiha ne. Lê piştî demekê ku pişta xwe rast kirin, hêdî hêdî berê xwe didin, tên cem me. Em bawer dikin wê di rojên pêş de, gelek kesên din xwe nêzîkî me bikin.

**Komisyona we ji bo pêş çi difikire, planên we çi ne?**

–Berî her tiştî, bi beşdariya hevalên nû, em dixwazin gavên mezin biavêjin, hemleyên nû bikin. Mesela li ser dagirkirina (îşxalkirin) Başûrê Kurdisatanê, em dixebitin ku dokumantasyonan berhev bikin û di çarçeweya peymanên Neteweyên Yekbûyî de, meseleyê bînin rojevê. Li hêla din, li hemberî nexweşiyan kontrolên tenduristiyê (sağlık) wekî berê, bidomînin. Ji bo çareserkirina meseleya kurdan, çêkirin û oganîzekirina panel mitîng û konferansan... Li gorî îmkanên xwe, derbarê vê meseleyê de em dixwazin anketan çêbikin.

**Berpirsiyarên komeleyê (İHD) ji bo van xebatên we tu astengî derxistin pêş we?**

–Berî em bersivê bidin vê pirsê, ez dixwazim bidim zanîn ku ez endamê lijneya kargeriyê me. Bi texmîna min yek ji ferqên İHD'ê jî, ev e. Biryarên ku ji komisyonan derdikevin, bi wî şertî ku ne li dijî prensîbên İHD'ê bin, tu carî rê li ber wan nayê girtin. Gelek beyanat û civînên çapemeniyê çêdibin, lê gava meseleyek derdikeve, bi lijneya kargeriyê re tê rûniştin û ev problem bi awayekî demokratîk tê çareserkirin. Heta îro meseleyek wiha jî derneketiye.

**Eleqeya kurdan li hemberî we çawa ye?**

–Wekî min di destpêkê de jî got, meseleya kurdan, ketiye rojeva dinyayê. Ji bo vê yekê, lazim e em der barê vê meseleyê de ji agahiyên teknîk haydar bin û karibin raporan amade bikin. Ev kêmasî jî, bi alîkariya kurdan wê bê helkirin. Divê hemû kurd bi baldarî me ji neheqiyên ku li wan dibin, agahdar bikin û kesên ku nizanin li heq û hiqûqên xwe bigerin jî, di vê meseleyê de wan haydar bikin.

Di heqê komeleya me de, ji bo avabûna Komisyên Mafên Kurdan û Mafên Hindikahiyan, dawe hatiye vekirin. Di 5'ê kewçêrê (çiriya pêşîn) de mehkemeya ya me heye. Em hemû kesên welatparêz û eleqedar dawetî daweyê dikin û dîsa ji van derdoran dixwazin ku ew bi xebata xwe beşdarî karên komîsyona me bibin.

## Li hemberî êrîşên gerîla yên tund û dijwar;

# Çeperên leşkeran yek bi yek dişkên



*Vê hefteyê gerîlayên ARGK'ê li gelek deveran girtin ser qereqol û çeperên leşkeran, di van rûdanan de gelek ziyan li artêşa tirk bû. Li hemberî vê yekê hêzên asmanî yên aştêşa tirk çiya û gundên Kurdistanê bombebaran kirin. Li gorî agahiyên ku ji Ajansa Kurd–A'yê ketin destê me, ev bûyer qewimîne.*

**12.07.1995**

Li devera Erziromê li nêzîkî gundê Zeyneliyê şerê ku li du cihan di navbera hêzên dewletê û yên gerîla de rû dabû, 5 leşker hatibûn kuştin. Piştî şer, helîkopterên kobra deverê bombardûman dikin, li mifrezeyeke xwe jî didin. Piştî lêdana mifrezê, hate zanîn ku gelek leşker mirine û birîndar bûne.

Çavkaniyên binecihê didin zanîn ku herêm bi berdewamî tê bombebarandin û agir ji daristanan bilind dibe.

Êvariyê, hêzên dewletê yên li çiyayê Cûdî, li Kela Jaro akincih bibûn, bi ber hêrîşa hêzên ARGK'ê dikevin. Di encama van hêrîşan de, 3 çeperên leşkeran bi tevayî binbirr dibin û 3 çeper jî, ji lephilanînê dikevin. Leşker, kuştî û birîndarên xwe bi firokeyan dikişînê.

Hêzên ARGK'ê di eynî rojê de êrîşek birine ser bineciheke leşkerî li devera Deştanê. Li wir ziyaneke mezin bi hêzên dewletê ketiye û gerîlayek jî bi sivikî birîndar bûye.

Li êvariya 11'ê tîrmehê, hêzên gerîlayan li devera Oremarê, bi ser 2 çeperên hêzên tabûra Ştanzenê de digirin. Di encama vî şerî de her du çeperên leşkeran jî, ji aliyê gerîlayan ve têne standin. Temet ku ji bêtêlên leşkeran hatiye zanîn, digel kuştina 9 leşkeran, gelek leşker û noker (cerdevan) jî hatine birîndarkirin. Di nav birîndaran de 2 serleşker jî hebûne.

Destkeftiyên gerîlayan di vî şerî de ev bûne:

2 çekên MG3, 5 çekên G 3, Topek bi gelek berkan ve,1 BKC, gelek fîşek û ewên dîtir. Her di vî şerî de 2 gerîlayan jî birîndar dibin.

Li devera Colemêrgê, nêzîkî gundê Evciya Çelê ve ye. Di navbera hêzên ARGK'ê û yên dewletê de, ji 6'ê serê sibê heta bi 11'ê nîvro şerekî dijwar rû dide. Di encama vî şerî de, digel serleşkerekî, 12 leşker têne kuştin. Piştî şer, hêzên gerîla bê ziyan ji devera rûdanê bi dûr dikevin.

Roja 12' tîrmehê, li devera Amedê li navbera Licê û Gencê, şerekî dûr û dirêj di navbera hêzên ARGK'ê û yên dewletê de rû dide. Hêza dewletê li hemberî hêzên ARGK'ê têne şikestin. Cara duduyan bi hêrîşê radibe, lê vê carê jî, bi kuştina 8 leşkeran û bi brîndarbûna 2 leşkeran dîsa bi paş de vedikşe. Her di vê rojê de, nêzîkî sengerê Korxê ku bi ser Licê ve ye, hêzeke dewletê tûşî buseyeka gerîlayan dibe. Li vir jî 2 zîlên leşkerî ji aliyê gerîlayan ve têne lêdan. Hate zanîn ku di vî şerî de serleşkerek û 4 leşker birîndar bûne. Her wisa di 11'ê tîrmehê de, nokerek bi navê Evdilqadir, li deşta Silîva ji aliyê gerîlayan ve hate kuştin

**13.07.1995**

Roja 13'ê tîrmehê, riya Bayqanê û Bilîsê, bi direjiya yek demhijmêrê di bin kontrola gerîlayan de dimîne. Di vê çalakiyê de hêzên gerîla nêzîkê 100 otobosan radiwestînin û hemû rêvingan li kêleka rê kom dikin û derbarê xebat û armancên xwe de propaganda dikin. Her wisa hêzên gerîlayan trumpêleka TEKEL'ê û trumpêleka YSE'ê dişewitînin û gerokekî japonî bi navê Koiçkî Îsvata bi xwe re dibin û ji devera rûdanê bi dûr dikevin.

Êvariya 13'ê tîrmehê. Li devera Erziromê, hêzeke dewletê ku li gundê Zeynelî akincih bûbûn, bi ber hêrîşên gerîlayan dikevin. Di encama vî şerî de 5 leşker dimirin û 3 jî birîndar dibin. Her wisa destkeftiyên gerîlayan jî bi vî rengîn e. Çekek MG 3, Moşek avêjek B 7 û hin dek keleperên dîtir. Her wisa di riya Sancaqê de jî zîleke leşkerî ji aliyê gerîlayan ve hate sotandin. Hêzên gerîlayan, bêyî ku ziyanekî bidin ji deverên rûdanan bi dûr dikevin.

**14.07.1995**

Roja 14'ê tîrmehê li devera Colemêrgê, li derdorê gundê Bilîcanê ku bi ser Çelê ve ye, hêzeka leşkerî derketibû qoleçanê. Her di vê navberê de, dikevin buseya gerîlayan. Di encama rûdana şerê di navbera her du hêzan de 4 leşker têne kuştin.

Ji layekî din ve her li devera Mêrdînê leşkerên ku derketibûn operesyona Omeriyan, li 2 mayînê ku gerîla çandinbûn dilukumin. Di vê rûdanê de jî du leşker dimirin.

Her di vê rojê de li devera Bagokê di navbera Hêzên dewletê û yên ARGK'ê de ji serê sibê heta bi êvarî şer rû da. Hêzên dewletê gelek ziyan lê bû, 2 gerîlayan jî jiyana xwe raspartin.

Roja 14'ê tîrmehê li devera Osmaniyê hêzên gerîlayan riya navbera Osmaniyê û Zorkumê mawey demekê xistin bin kontrola xwe û ji cemawerê re peyivîn.

Roja 14'ê tîrmehê hêzên asmanî yên bi ser Arteşa dewleta tirk ve, li Badînan Şûnwarên wekî; Gundên Ewênka, Turbela, Xerê, Newala Kêşanê, Şeranîşê û Gelyê Pisaxa mawey seat û nîvekê bombebaran kirine. Di encama vê bombebarankirinê de gelek jin û zarok hatine birîndarkirin û ziyaneka mezin gihîştiye malê gundiyan.

Roja 14'ê tîrmehê li deşta Erzîngganê hêzên dewletê hêrîşî ser gundiyên Mertekê dikin. Di vê hêrîşa leşkeran de gundiyek tê kuştin û 2 kes jî birîndar dibin.

Roja 14'ê tîrmehê li devera Dêrsimê, di rûdana şerê li navbera hêzên dewletê û yên gerîlayan de, li ser girê Gomikan ku bi ser Pertekê ve ye 3 leşker têne kuştin. Bêyî ku ziyanekê bidin, hêzên gerîla ji devera rûdanê bi dûr dikevin.

Roja 14'ê tîrmehê li devera Colemergê nêzîkî Çelê li ser riya Tabûra Bilîcanê ji aliyê gerîlayan ve 2 mayîn têne çandin. Piştî demeke kurt zîleke leşkerî li wan dilikume. Digel têkûpêkçûna zîlê, serleşkerek û 4 leşker têne kuştin.

**Kurd–A / Welatê Me**

## Siyaseta tirkan ya şerxwaz û nijadperest

Ji avakirina komara tirk û heya niha, Tirkiyeyê çav berdane Başûrê Kurdistanê. Karbidestên tirk pirî caran planên destdirêjiyê amade kirine. Ew dibêjin: Wegerandina Wîlayeta Musilê." Her wisa ji bo Îranê jî Tirkyeyê xwedîtî li azeriyan kiriye û xwestiye wan bi xwe ve girêbide û her bendewarê derfetekê ye ku wan ji Îranê veqetîne. Ev pirsa han û dubendiyên dîrokî di navbera herdu dewletan de dijberî û dijminahiyê peyda dikin.

Herwiha di sala 1938'an de Fransayê herêma Îskenderûnê (Hatay) ji Sûriyeyê birî û diyarî Tirkyeyê kir. Da ku ew di şerê cîhanê de xwe bide aliyê Fransayê û dostên wê. Ew nebe alîgirê Almanyayê.

Sûriyeyê heya roja îro jî ev parçekirin nepejirandiye. Hê di salên pênciyî de di navbera Sûriyeyê û Tirkyeyê rewş gihîşte tenga şerê germ. NATO'yê wê demê dixwest hikûmeta pêşverû li Sûriyeyê wergirîne. Di wan salan de Tirkiyeyê sînorên xwe bi Sûriyeyê re girt û li ser herêmeke tampon ava kir û tê de mayîn bi cih kir. Tirkiye, ava ku ji bo Sûriyeyê pêdiviyeke mezin e wekî şantajekê bi kar tîne. Di vir de dixuye, ku siyaseta komara tirk berdewamiya siyaseta dewleta Osmanî ye, bi wateya, ku xêr û bêra rojhilata navîn pêwist e ji wan re be. Siyaseteke wisa nabe bingeha pêwendiyên dostane di navbera gelan û dewletan de.

Bo Yunanistan û Qibrisê jî şerxwazî û dijminahiya Tirkiyeyê her berdewam e. Gelek pirsgirêkên mezin di navbera wan de hene û herdu dewlet pir caran gef û guran li hev dixwin. Parçekirina Qibrisê bi destê tirkan di sala 1974'an de, careke din rûyê wan yê şerxwaz nîşan da. Tirkiyeyê piştî 80 salî jî siyaseta sala 1915'an a li hemberî gelê ermen û kuştina du milyon însanî ji wan, rast dibîne. Hê jî berdewamiya wê siyaseta xwînrêj û hovane dike. Di demên dawîn de jî, dema şerê di navbera ermen û azeriyan de, Tirkiyeyê bi awayekî eşkere piştgirirya azeriyan kir û xwe amede kir ku êrîşên leşkerî bibe ser Ermenistanê.

Gelê bulgarî jî 500 sal di bin zordariya tirkan de maye. Ew baş dizane, çawa û li ser çi bingehê ev komara tirk hatiye avakirin. Pêwendiyên Bulgaristanê bi tirkan re her tim di siya dîroka osmanî de pêk tên. Ji tirsa osmaniyan (tirkan) bulgaran tim xwe bi Rûsya ve girêdaye û pişta xwe pê mehkem kiriye, îro jî pêwendiyên Bulgaristanê bi Tirkiyeyê re ne ewqas dostane ne.

Li hemberî nexşeka siyasî ya wisa eşkere dibê ka çima baweriya dewletên cîran bi Tirkiyeyê nayê û çima dostaniyeke rast û berdewam di navbera wan de çênabe.

Siyaseta tirkan ya şerxwaz û nijadperastiya wan, îro ji hemû demê bêtir îflas kiriye û ew rezîl û riswa bûne. Çi di warê leşkerî û çi di warê aborî de. Her wiha çi di warê siyasî û civakî de Tirkiye di nav buhraneke mezin de ye.

Piştî şerê kirêt pêwist e êdî karbidestên tirk têbigihîn ku bi leşker û şer û êrîşan çare li vê dozê nabe. Bandora şer wê tevjiyîna gelê kurd û tirk dijwar bike. Lewre wê çêtir be, eger rojekê pêş de şer raweste û danûstandinên aştiyê dest pê bikin. Hem karbidestên tirk û hem ji hikûmetê amerîkî û ewrûpî jî pêwist e bipejirînin ku gelê kurd divê karibe bi xwe nûnerên xwe ji bo hemû kar û baran hilbijêre. Eger ew ducar bikin û bêjin: "Em bi PKK'ê re nadin û nastînin," wate ew e ku ew naxwazin çareyek ji doza gelê kurd û Kurdistanê re hebe. Biryara gelê kurd pêwist e di destê gelê kurd de be. Eger biryara me ne di destê me de be, em nagihîn mafên xwe. Ew jî baş dizanin ku PKK û gelê kurd bûne yek can û bê PKK'ê gelê kurd bêpêşeng dimîne.

Gelê kurd şer naxwaze û dest ji dil dirêj dike bo aştiyê. Ew rastiya ji aliyê PKK'ê ve her tim hatiye gotin û pêşniyaz jî hatine kirin bo şêweyên aştiyê. Çareserkirineke siyasî li doza Kurdistanê bêşik xizmeteke mezin e ji bo Tirkiye û Kurdistanê. Her wiha ji bo Rojhilata Navîn û hemû gelên cîhanê.

**DR. GUNDÎ DILBERZ**

# Werger û mantiqa zimên

Di pêşveçûna zimanan de, werger xwedî roleke giranbuha ye. Zimanên ku îro di qada navneteweyî de giraniya xwe ji her alî ve bi hemû gel û neteweyên dinyayê dana pejirandin jî, di destpêkê de, ji wergerê gelek îstîfade kirine. Kurdî ji aliyê peyvên sirûştî û çandiniya kevin ve xwedî zengîniyeke berbiçav e; lê ji aliyê peyv, wûşe û têgihên zanistî û teknîk ve pir û pir şûnde maye. Soranî di vî warî de li gorî hemû zaravên kurdî yên din di rewşek çêtir de ye. Li gel vê pêşveçûnê, dîsa jî, em nikarin soranî û zimanê gelekî xwedî dewlet, bidin ber hev. Bi wergerê ev kêmasiyên bingehîn ên zimên, kêm zêde ji holê radibin û wûşezanîna (termînolojî) zimên hêdî hêdî bi cih dibe. Heta radeyekê di çareserkirina gelemşên zimên de divê em, jî ji wergerê îstîfade bikin. Lê gerek e werger, werger be û li gorî pîvanên zanînê bê kirin.

Di van salên dawîn de hinek kitêbên edebî, civakzanî û hwd. ji aliyê hinek rewşenbîrên kurd ve hatine wergerandin. Ev werger bi zêdehî li Ewrûpayê, li Ewrûpayê jî, nemaze ji aliyê rewşenbîrên kurd ên ku bi penaberî li Swêdê dijîn ve, hatine kirin. Bi van kitêb û nivîsên hatine wergerandin, em hîn bûn ku ji bo kurdî "werger" roj bi roj tê wateyeke din. Ev jî bi navê vejîna kurdî, mirdarkirina kurdî ye. Ev rastî, bi zêdehî di berhemên "wergerên" kurmancî de derdikeve holê. Ji ber ku piraniya rewşenbîr, nivîskar, zanyar û zanayên kurmanc bi peyvên kurdî, tirkî dinivîsîn. Ev yek ji bo mirovên me yên bi zazakî dinivîsin jî, rastiyek e. Ev rastiya kambax tenê kêrî tiştekî tê; neyarên kurd û Kurdistanê bi me dide kenandin, dilê hemû mirovên kurd û yarên kurdan dişkîne, bêhna wan teng dike. Her ku diçe gelek mirovên me, ji ber sedemên wiha ji baweriya xwe ya bi çanda kurdî bi dûr dikevin.

Werger her ku diçe di nav zanîn û edebiyatê de girîngiya xwe zêdetir dide berçavan. Dîroka wergerê bi qasî dîroka mirovahiyê kevin e. Ji bo ku mirovên bi zimanên cur bi cur dipeyivin, ji hev û din fem bikin, di her demeke dîrokê de, pêwistiya komên mirovan, gel û neteweyan bi wergerê hebûye. Berî îcadkirina nivîsê bi hebûna zimanan re wergerê dest bi jiyanê kiriye. Bi gotineke din em karin bibêjin ku ji destpêka jiyana mirovahiyê bi vir de, werger heye. Hemû beşên zanîn, huner, edebiyat û hwd. yên pêwendiya wan bi jiyana civakî ya mirovan re hene, xwedî pîvan in. Ev pîvan di her demê de, li her deverê, ji aliyê zanyarên di warên xwe de pispor ve hatine amadekirin û diyarkirin. Ev pîvan li gorî demê ji bo pêşveçûna jiyana civakî dîsa bi destên zanyarên hemdem, li gorî zanîna hemdem kêm zêde hatine guhertin. Ji van pîvanan hinek ji vîna mirovan der in. Ev tim di cihê xwe de mane. Tu kesî, di tu demê de nikarîbûye van bileyize. Hin pîvanên wergerê yê bi vî rengî jî hene.

**Dîroka wergerê bi qasî dîroka mirovahiyê kevin e. Ji bo ku mirovên bi zimanên cur bi cur dipeyivin, ji hev û din fem bikin, di her demeke dîrokê de, pêwistiya komên mirovan, gel û neteweyan bi wergerê hebûye.**

Qeydê rêzimanî çawa di nav gel de bi aweyî nezanî, ji derî vîna mirovan li gorî pîvanên zanînê pêk tên, ên wergerê jî heman wisa nin. Ji bo ku rojekê pêşda rê li ber vê domana ku zimanê me mirdar dike, were girtin, ez dixwazim çend pîvanên bingehîn ên wergerê bînim bîra van rewşebîrên kurd.

1– Peyv nayê wergerandin, têgih tê wergerandin. Di vê babetê de, wûşe û gotinên mezinan xwedî girîngiyeke taybet in. Rewşenbîrên kurd ên ku van salên dawîn bi wergera kurmancî re mijûl dibin, an bi rastî haya wan ji vê tune ye, an jî naxwazin jê haydar bibin. Bi vê kirina xwe "wergêrên" me kurdan rûpelekî "nû" li metodên zanistiya wergerê zêde kirin. Rûpelekî reş û tarî yê ku ji xeynî kurdan wê tu kes, tu demê ne bibîne, ne jî pê bihese. Hem jî di ronahiya metodên zanistî yên wergerê de. Heke em bi çend mînakan li ser vê mijarê bisekinin, ewê baştir bê fêmkirin.

Wûşeke tirkî: "Kabak başima patladi" Peyv bi peyv wergera wê : "Kundir di serê min de teqiya" Wergera wê ya rastîn: "Kevir û kuçik li min bariyan" an jî "kasik û kafik bi serê min de şikestin" û hwd. wûşeke îngilîzî: "It is raining the cats and the dogs." Peyv bi peyv wergera wê: "Pisik û kûçik dibarin." Wergera wê ya rastîn: "Wekî asîman qul bûbe," "Te di got qey asîman qul bûye" an jî "Wekî tu devê cêr ber bi jêr bikî" û hwd. wûşeke tirkî ya din: "Koltuklarım kabardi." Peyv bi peyv wergerandina wê: "Binê çengên min nepixîn" wergera wê ya rastîn: "Ez pê serbilind bûm," "Ez gelekî dilgeş bûm" an jî "Baskên min hebûna ez dê bifiriyama" û hwd. Zêdekirina hejmara mînaka gengaz e. Ji bo têgihîştina gelemşeyê ewqas jî bes in. Niha em li rewşa xwendevan binihêrin.

Xwendevanê ku zimanê jê nivîs hatiye wergerandin qenc nizanibe, an jî baş zanibe, lê haya wî ji wûşeya ku hatiye wergerandin tune be, ji van hevokên peyv bi peyv hatine wergerandin, kane çi fem bike. Bersiv ji peyvekê pêk tê. Qet, herê qet tiştekî nêzîkî wateya têgihiya wûşeyê nikare fam bike. Werger ji bo mirovên ku bi zimanê jê tê wergerandin nizanin, derketiye holê.

Hinek wûşe û gotinên mezinan, di hinek zimanan de hempar in. Piraniya van bi sedemên civakzanî werin zimên jî, yên ku tesadûfî ne jî hene. Ev wûşe û gotinên mezinan ji aliyê peyv û têgihê ve bi temamî heman (eynî) wateyê didin. Di wergerê de peyv bi peyv tên wergerandin. Ji aliyê hejmarê ve pir kêm in. Niha em bi çend mînakan dabaşa van bikin. Di fransizî heye: "Sauter de branche en bernche." Peyv bi peyv û li gor têgihê wergerandina vê ya tirkî bi heman peyvan pêk tê, xwedî wateyeke cihê nîn e. Tirk jî ji bo vê wûşeyê dibêjin: "It itin kuyruğuna basmaz." Ev jî rastiyek ji rastiyên zimanan e.

2– Her zimanek xwediyê mantiqeke cihêreng e. Mirovê ku mantiqê zimên nizanibe, nikare wergerê bike. Piraniya rewşenbîrên kurmanc ên li pêşiya navên xwe wergêr dinivîsin, ji vê rastiyê jî haydar nîn in. Niha em li ser mantiqa zimên çend mînakan bidin. Tirk dibêjin: "Guneş doğdu. Kadin çocuk doğurdu. Keçi doğurdu. Köpek doğurdu. İcime doğdu." Peyv bi peyv wergerandina van hevokan: "Rojê za. Jinikê zarok za. Bizinê za. Kuçik za. Ber bi hundirê min za." Kurd di jiyana xwe ya rojane de û di wergerek li gorî pîvanên wergerê de van hevokan wiha bi kar tînin: "Roj derket. Jinikê zarokek anî. Kûçik taliqî. Li min eyan bû." Wekî tê dîtin "zayîn" a kurdî û "doğmak" û "doğurmak" a tirkî tenê di hevoka "Bizinê za" de bi heman mantiqî hatiye bikaranîn. Ji bo kişandan cixarê, kurd lêkerê "kişandin" ê fransiz lêkera "fumer", îngilîz lêkera "to smoke" tirk lêkera "içmek" bi kar tînin.

Di vê mînakê de, matiqa îngilîzî, fransizî û kurdî li ser pêwendiya dûman û kişandina dûmanê digihên hev. Lêkerê tirkî yê vê mînakê "içmek" di kurdî de, tê wateya "vexwarin". Mirov kare minakeki din a ku bi temamî ji aliyê dawînê ve berevajayî van minakan be jî, bide. Pêwist nîn e. Tirk dibêjin "Çad Erzuruma baglidir." Dema ku em vê hevokê peyv bi peyv wergerînin kurmancî, dibe "Çad bi Erzerûmê ve girêdayî ye" bi wergerandineke çewt peyv bi peyv "Çad girêdayî Erzerûmê ye." Di nav gelê kurd de, tu kes, li tu deverê rastî bikaranîneke bi vî awayî nehatiye. Di berhemên edebî yên klasîk ên bi nav û deng de jî kes li vê bikaranînê rast nehatiye. Rastiya wergerandina vê hevokê; "Çad li ser Erzerûmê ye" an jî "Çad bi Erzerûmê ve ye." Lê gerek e em ji bîr nekin li ev awayê duyemîn li gorî yê yekemîn kêmtir tê bi kar anîn. Lê peyv bi peyv ji tirkî wergerandina vê hevokê, wekî hemû mînakên din, tenê zirarê dide zimanê me.

ROJHAT AZADÎ



# Li Berlînê heftiya fîlmên kurdî

**Di navbera 27 û 31'ê vê mehê (tîrmehê) de li bajarê Almanya li Berlînê heftiya fîlmên kurdî heye. Bi pêşkêşiya Enstîtuya Kurdî ya Zanîn û Lêkolînê ev heftî çêdibe. Di vê heftiyê de her rojê du film wê bên nimandin, buhayê seyrkirina her fîlmekî 8 DM ye.**

| Mejû: | Seat | Navê film |
|---|---|---|
| 27.07.1995 | 17.30 | Siyabend û Xecê |
| | 19.30 | Durchs Wilde Kurdistan |
| 28.07.1995 | 17.15 | Serçawan |
| | 19.00 | Reşpoşi Şuşeyî |
| 29.07.1995 | 17.30 | Kilamek ji bo Beko |
| | 19.30 | Hakkaride Bir Mevsim |
| 30.07.1995 | 17.30 | Yol |
| | 19.30 | Kerwanekî bêdeng |
| 31.07.1995 | 17.30 | Siyabend û Xecê |
| | 19.30 | Serçawan |

**Cihê ku film wê lê bê nîşandan**
Filmbühne am Steinplatz
Hardenberg Str.12,10623 Berlin
**Tel:** 030-3129012

**Cihê bilêt temînkirinê**
Enstîtuya Kurdî
Zossener Str. 41,10961 Berlin
**Tel:** 03069002695 – 03069002346

www.arsivakurdi.org



*Çîrok*

# MERWAN

Di odeya ku ji wî pê ve tu kes tê de tuneye de, ev bû car saet ku wekî derwêşekî bikeve zikrê, bi serê xwe bû. Xwelîdank jî pûçikên cixaran misêwa bûbû. Porê wî gij û tevlîhev bûbû. Çend dilopên xwîdanê xwe berdabûn ser wêneyê li ber wî. Di nav nivînan de pal dabû.

Rahişt wêne, kire nav xelîtika xwe. Xwe li ser zikê piştê dirêj kir. Çavên wî bi zikê xênî ve zeliqî man. Çend deqeyan di wî halî de ma. Deriyê odeya wî got zîq û vebû.

Diya wî di dest de melkes, bi dengekî nerm got:

– Berxê min! Tu ne çûyî dibistanê, ne jî çûyî alîkariya bavê xwe. Bavê te bûye wekî hejekî. Hew dikare bi rê ve here. Êvarî dema ku tê mal, dibê tep û dikeve. Heta nivê şevê dinale. Me, kekê te da xwendin, piştî xwendina 7 salan bû bijîşk. Lê agir bikeve mala bêbext û zaliman, laşê wî xirinandin, me nekarî laşê wî jî ji serê çiyan bînin. Em ji Nisêbinê çûn heta bi çiyayê dora Licê. Rebî kezeba diya wî subayî jî bihele. Cendekê Fexriyê min neda me.

Merwan, bi nerîneke vala û bêmane, li rûyê dayika xwe nêrî. Got:

–Dayê dev ji min berde. Odeyên din bimale (rêşke). Dest bi xwendina pirtûka li kêleka xwe kir. Şiklê kekê wî di nav rêzên pirtûkê re xuya dikir. Rêz tevlî hev dibûn. Tiştên ku Merwan dixwendin diketin guhêkî wî, di guhê din re derdiketin... Zarokatiya wî dihat bîra wî. Dema ku ew û Fexrî bi hev re diçûn girtina masiyan... Dema ku ava bûzê difirotin û heqê çûyina sînameyê derdixistin. Dema ku li kolanan ew û zarok pev diçûn û Fexrî piştgiriya wî dikir. Serpêhatiyên wî yek bi yek di ber çavên wî re derbas dibûn.

Tiştek hebû ku qet ji bîra wî nediçû. Rojekê mamosteyê wî, çima ku wî sarîtî kiribû, dar li serê wî dabû, şikandibû. Dema ku Fexrî çav lê kir. Sedema şikestina serê wî hîn bûbû. Rahiştibû kêra kesaxê reya wî mamosteyî biribû.

Wexta Fexrî di fakuleteya textoriyê de dixwend. Hinek name ji Merwan re dişandin. Di nameyê xwe de gelek henek dinivîsîn. Û digot: "Birayê min î şêrîn, kengî ez bûm bijîşk ezê ji te re gelek tiştên xweşik bistînim. Ezê te li dibistaneke rind bidim xwendin."

Gelek caran jî pirtûk û pênûsên rind ji Merwan re dişandin.

Merwan rabû ji nav pirtûkan rojnameya "Yeni Ülke" derxist rûpelên wê zîvirandin. Îlana şehîdbûna Dr....X careke din jî xwend.

"Pilingê çiyan, tu ji bo welat û gelê xwe
Bûyî zava, li çiyayê...... bîranîna te
riya me ronî dike.
Peyman rûmet e. Em
rûmetê nadin bin piyan...."

Dawî çiya, daristan ketin bîra wî de. Ji xwe biçûktiya wî li gundekî çiyê borî bû. Bi bavê xwe re carinan diçû nêçîrê. Ew qermîçoka li eniya wî hêj ji zaroktiya wî mabû. Rojekê ew dîsa bi bavê xwe re çûbû birîna keleman. Zivistan bû, her derê qeşa girtibû. Gava Merwan destê xwe avêt ku zembelîlkê jêke, gindirî û serê wî şikest. Ew deq ji wê rojê ve li eniya wî ye. Ji şeş saliya xwe bi vir ve li navçê dijî. Gund, çiya rewşa zaroktiyê wekî xewneke bi xumam di hişê wî de mane.

Kekê wî Fexrî li serê zinarekî wekî bîrdariyekî (abideyek) rawestayî bû. Bi rext û fîşekan rapêçayî bû. Çend deqan li ser vê xeyala şêrîn fikirî.

Merwan got: "Ev çi xewneke malmîrat bû. Kekê min wekî baranekî avrêlê hat û çû. Bi jiyana xwe şa nebû. Bi xortaniya xwe şa nebû. Lê wî li ber nehaqî û zilmê tu caran serî dananî. Herdem jî digot: "Mirineke bi rûmet, ji jiyaneke bi qirêj çetir e." Dema ku rojname dixwend, bi nûçeyên şewitandina gundan, bi kuştinên faîl meçhûl û cendekên şervanan yên di ber hev re dirêjkirî, pir xemgîn û hêrs dibû. Gelek caran dev ji xwendina rojnameyê berdida. Cixarek pedixist û bêdeng dima.

Her tişt bûbû derzî, bûbû, stirî di laşê Merwan re dibû. Ne henek dikirin. Ne jî bi henêkên ku dihatin kirin, dikenî. Mirov digot qey herdem çavên wî bi hêstir in. Diçû, dihat li kaseta Egîd dihisand. Car caran jî di ber xwe de starana "lê dayê bes e binale, nalîn ji me re ne kar e" digot....

Hêdî hêdî daxwaza Fexrî ya herî girîng ku jê kiribû li berçavên wî reş dibû. Êdî dev ji qezenckirina fakulteya hiqûqe berdabû. Berê digot: "Ezê bibin ebûqat, gelê xwe mirovên jar û bêçare biparêzim." Ev raman ji dilê wî derket Bîrdariya Fexrî ew bi ber xwe ve dikişand. Di nava dil û mêjiyê wî de qar, hêrs û tolê, ji hev veqetîna bêdawî, hew hevûdû dîtina bêserûbin, bi tenahiyeke dûvdirêj re, govend digerandin.

Êvarî piştî xwarina şîvê, li odê qasekî bêdengî çêbû. Diya Fexrî Îskanên çayê tijî kirin. Bavê wî bi kevçiyekî çayê şekir diheland. Kevçî li îskanê diket, deng derdixist. Diya wî dest bi axaftinê kir:

–Lawo ez û bavê te bi hev re axivin. Kekê te şehîd bû. Ji destê me firî. Çûyîna wî di dilê me de kunerek e ku heta hetayê ji bîr nabe. Fanosa dilê me vemirî, şuşeya dilê me şikest. Qeremên me qerifîn. Me dil heye em te bizewicînin, qene bila neviyekî me çêbibe, da ku hinekî em xwe pê ji bîr bikin. Tu jî hinekî xwe biparêze. Ji bo welêt me şehîdek da. Ka bila her serê malê wekî me yekî ji xwe feda bike. Dû re tu jî xwe bide pêş.

Bi van gotinan birûskekê li ber çavê wî veda. Tevzînok bi laşê wî ket, sergêjek lê geriya.

Merwan wekî pezkoviyekî ku ji nêçîrvan bireve, an jî şêrekî ku jî qefesê derkeve, rabû ser piyan û riya derve girt. Şeveke tijî stêr bû. Ji aliyê Newala Bûnisra û Çiyayê Bagokê ve bayekî hênik dihat. Di vê wexta şevê de, bêje hema tu kes li kolanan tune bû. Çend kesên serxweş qijemîj û dujmîn dikirin. Barebara yekî ji wan bû, digirî. Merwan di nav bexçê Nafido re berê xwe da pira Eleman. Hinek tirs jî di dilê wî de hebû. Digot: "Heke tîm li nav daran hebin, kêmîn çêkiribin. Ji xwe bêpirs li mirov direşînin." Hêj di nav van tirs û gumanan de bû, dît ku gihiştiye pirê. Got "Li cihekî latek hebû. Dema em biçûk bûn di çemê Çexçex de me soba dikir, me xwe li ser wê latê divedizîland. Ew lat dît, li ser rûnişt. Çemê Çexçex hatibû birîn. Ava çem berdabûn kenalên pembû. Bêhna kevzê, pûngê diket pozê mirov. Tayeke dijwar pê girt. Laşê wî, lêva wî wekî pelê darê ricifî.

Piştî wê ricifînê tayê ew berda. Bi ser xwe ve hat. Bena wî fireh bû. Qasekê ber bi çiyayê Bagokê ve awirên xwe vedan. Stêrkek xuricî, Merwan bi dilêkî xweş vegeriya mal.

Ji rojan în bû. Bavê wî çûbû xutbê. Hevalê wî Mehsum li derî xist. Dayika wî derî vekir û got:

–Delalê min were hundir. Merwan li odeya xwe ye. Nizanim bê çi bela wî ye. Ev çend seat e bêdeng e.

Mehsûm çû odê. Piştî çend deqeyan bi hev re derketin. Ew derketin, bû derketina herî dawî.

Bavê wî li odeya wî, li ser masê nameyek dît. Name li cem wêneyê Fexrî bû. Vekir û xwend:

"Ji ber ku min xatir ji we nexwest û destên we ranemûsand, ez pir xemgîn im. Ez pir fikirîm. Di navbera zewicandin û şervantiyê de çûm û hatim. Xew neket çavên min. Laşê min bû wekî ava ji xwêdanê. Belê min biryar da ku heta welat û jiyan azad nebe, kar, xweşî û şahî li me heram e. Wasiyeta kekê min li benda min e. Bila dilê we rehet û xweş be, heta roja azadiyê bi xatirê we........... Delîl"

**HESEN ZINAR**

## Kurdo hawar e...

**ÎBRAHÎM EHMED**

Kurdo hawar e...
Kurdo, to xakî letlet kirawit
To, berî rencî be zor birawit
To Kurdistanî be xwên gulgûnit
To, be Qendîl û Pîremegrûnit
To Agrîdax û çiyay şîrînit
To, gelî dîlî bêbeş le jînit
To, cergî daukî kûr hewasrwit
To, dilî bûkî zawa kujrawit
To, Şehîdanî gişt kurdistanit
To, dilî pakit, to be îmanit
To xot, to xwat, to xoşewîstin
Besye nakokî û besye yek kûştin
Pêşmergey nebez ebê bizanî
To piyawî kes nît, hî Kurdistan î
Ew serkirdeyey ke wa pêt delê

Gulle bigrîte biray kurdî xot
Gûmanit nebê, û zor çak bizane
Ewe dûjmine û ewe xwênê xot
Dûjminî gewrey to, dagîrkere
Ger hîwat bew bê, rencit bêbere
Her be yekitî û fîdakarî xot
Rizgarît debê le zincîr û kot
Her bi wîstin û tebayî û xebat
Gelanî dinya geyîwne awat
Tebayî ebêt çît le jîn kem e
Her natebayî serçawey xem e....

*Nivîskar û siyasetmedarê kurd Îbrahîm Ehmed, ev helbest, ji bo nehêlan û nefretkirina ji şerê birakûjiyê nivîsandiye, wî bi xwe ji me re şandiye û xwest ku em di Welatê Me de biweşînin.*

## Şorişî Televizyonî MED

Televizyonî MED, yekem televizyonî cîhanî setelayitî kurd e. Şorişêke bo xoy. Yekem care kurd, le pêş hemû netewe bê dewlet û mafxwrawekanî dinya da, em despêşxeriye şaristaniye mezine bikat..Eme bazdanêkî mêjûyî gewre û giringe.

Emro, dinya bo hoy teknolojyay zanyarî û geyandinewe, bote gûndêkî gerdûnî biçûk. Telefizyonî MED zaminî ewey kird. Kurdîş lew gûnd e gerdûniye da malêkî hebêt şanazî pêwe bikat..Lew male da, hemû xelkî Kurdistan, hemû êwareyek bo mawey sê demhijmer wek yakxêzan dadenîşin, axawtin deken, xoşî le musîqa, ferheng û kulturî neteweyiyan werdegrin, goranî delên û helperkê deken. Eme le hemû şitê ziyatir yekêtî ziman, ferheng, hest û hişyarî neteweyî gelî Kurdistan le başûr û bakur, rojhelat û rojawa be hêz dekat.

Boye şorişî MED le hemû şorişe çekdariyekanman giringtir e. Boye şorişî MED le hemû şitêkî dîke ziyatir dewletî Turkiyey herasan kirduwe. Eweta wek rojnamey Gardiyanî Berîtanî rojî (23–Gulan) delê; Le nawçey Kurdistan da destiyan kirdiwe be rawe setelayt. Eweta Turkiyay dîmokrat, Îlmanî, Awupayîxwaz û pêşkewtin xwazî!! xistote berdem duriyanêkî qurs û sext. Yan eweta debine beşêk le cîhanî serdem û lojîkî serdem ke mafî azadî û xoçarenûsînî netewey kurd qibûl deken û ewsa detwanin xoyan be Aurupayî û modern binasênin. Yan wek mellakanî Îran, debê sê sede bo diwawe bigerênewe û tarîktirîn şêwey daplosîn û kûştinî bîr û dengî azad be kar bihênin.

Diyar e Turke şovênîstekan, her rêgeyekiyan helbijêrin, encamê hetmîyekey her yeke:

Serkewtin bo kurd û Kurdistan.

Selaw le MED'î Şoriş, le şorişî MED

**DR. KEMAL MÎNAWDELÎ**

DI KONFERANSA PÊNCEMÎN YA YRWK'Ê DE KONSEYA KARGERIYA PKD'Ê ZUBEYİR AYDAR:

# 'Rewşenbîr mejiyê gel in'

**Li Kölnê bi beşdarbûna 120 rewşenbîrî, Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistanê (YRWK) konferansa xwe ya 5'an li dar xist. Dîvan ji van kesan pêk hatibû; Maşallah Öztürk, M.Emîn Pêncewênî, Selim Ferat, Mustafa Reşît û Fatma Dikmen. Di nav wan de jî, Maşallah Öztürk bû serokê dîvanê.**




**Dîmenek ji konferanseke Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistanê (YRWK)**

Li Almanya û li bajarê Kölnê bi beşdarbûna 120 rewşenbîrî, Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistanê (YRWK) konferansa xwe ya 5'an li dar xist. Konferans bi deqîqeyek rawestan ji bo bîranîna şehîdan vebû. Pişt re komîteya birêveber ya kevin dor da dîvana konferansê ku ji aliyê beşdaran ew ve hat hilbijartin. Dîvan jî, ji van kesan pêk hatibû; Maşallah Öztürk, M. Emîn Pêncewênî, Selim Ferat, Mustafa Reşît û Fatma Dikmen. Di nav wan de jî, Maşallah Öztürk bû serokê dîvanê.

Berî ku dîvan dest bi kar û barên xwe bike, ji aliyê Maşallah Öztürk ve, ev mesaj hat bilêvkirin: "Bi rastî rewşenbîr karên herî giran û dijwar divê bidin meşandin, lê îro em dimeyzînin ku rewşenbîrên me li gorî rewşa tevgera rizgariya neteweyî û li gorî rewşa welat erk û wezîfeyên xwe baş nayînin cih".

Li pey wî Serokê PKDW'ê Yaşar Kaya mesaja xwe pêşkêş kir, Yaşar kaya got: "Merca bingehîn ji bo pêşvebirina tevgera çandî û rewşenbîrî, yekbûna rewşebîran bi xwe ye."

Piştî wî jî Zubeyr Aydar mesaja xwe pêşkêş kir: "Rewşenbîr mêjiyê gel in, rola wan zor giran e, lê karên wan hêj kêm e. Hin kar hatibin kirin jî, ne bes e. Divêt di çarçoveya neteweyî ya fireh de kar û çalakiyên mezin bên kirin."

Alî Qazî jî, di mesaja xwe de got: "Rewşenbîr pêşengê gel e. Bi xwe her gelekî taybetiyên wî hene. Ji bo rewşenbîrên me, divêt ew hev bigirin û ramana wan kurdayetî be."

Piştî mesaj û axaftinan, komisyon hatin çêkirin, komisyonên ku hatin çêkirin ev bûn: Komisyona tesbîtkirina xebatê ji bo saziyên kulturî, zanistî û hunerî. Komisyona mesajan, Komisyona plana salekê.

Di nav komisyonan de piraniya beşdaran cih digirtin Komisyonan kar û barên YRWK'ê ji bo dema pêş zelal kirin û pir plan û nexşeyên tekûz bi hev dan pejirandin.

Herwiha komisyona mesajan jî, ev mesajên jêr pêşkêş kirin û hatin pejirandin.

– Mesajek ji bo Serokê Partiya Karkerên Kurdistanê Abdullah Öcalan.

–Mesajek ji bo Serokên PKD wê Yaşar Kaya.

–Banga konferansê ji bo rawestandina şerê kurdkujiyê li başûrê welêt.

Mesaj ji bona girtiyên şer (esîr) ên ku di zîndanên tirkan de ne.

Konferansa 2 roja dewam kir, û danîştina dawî ji bo hilbijatinê bû. Bi piraniya dengan ev kes ji komîteya navendî ya nû hatin hilbijartin: Selhatin Sora, Abdullah Uzun, M. E. Pêncwênî, Zulfiye Zeybik, Sîrwan Rehîm, Bekir Bahoz, Huseyîn Kulu.

**Biryarên konferansa YRWK ya pêncemîn ji bo salekê**

Konferansa YRWK'ê ya pêncemîn di rojên 15–16.07.1995'an de li Kölnê hate lidarxistin û ev biryarên jêr hatin girtin:

**1)** Ji bo avakirina şaxê Parisê YRWK navend di nav vê salê de civînan pêk tîne û şaxê Parîsê ji nû ve ava dike. Ji bo ku şaxê Parîsê ji nû ve rabe ser xwe, çalakiyên xurt tên çêkirin. (Wek civînên berfireh, şevên çandî û hwd.)

**2)** Konferansa çand û hunerê ya duyemîn di navbera 24–26'ê meha 11'an 1995'an de li Berlînê tê çêkirin. Bi navê bîranîna Ehmedê Xanî, kar û xebatên konferansê bi hin awayan amade bûne. Komîteya navendî ya nû bi van kar û xebatan re radibe. Her şaxên YRWK'ê jî li gorî derfetên xwe beşdarî vê konferasê dibe.

**3)** Bardewamiya wergerandina pirtûka Sekreterê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan bi navê "Ji sedsala XIX'an heya îro; Rastiya Kurdistanê û tevgera PKK'ê" divê heya 15 gelavêja 1995'an bê temamkirin.

**4)** Berdewaniya wergerandina her du pirtûkên jêr, jî tîpên erebî li tîpên latînî di nava vê salê de tê temamkirin.

**a–** Ferhenga Kurdî–Hejar

**b–** Mejûyî Edebî Kurdî– Aladîn Sûcadî

**5)** YRWK–navend hewl dide û alîkarî dike ku Yekîtiya Wênekeşên Kurdistanê di nav vê salê de ava bibe. Herwiha pêwendî bi hêykelteraşan re jî datîne.

**6)** Di nav salekê de komisyonên wergerandinê dadimezirîne.

**7)** Heya konferansa YRWK'ê ya 6'an, konferasên şax û komîteyan tên çêkirin. Di van konfersande ji navenda YRWK'ê jî hin kes beşdar dibin.

**8)** YRWK–navend ji bo xurtkirin û dewlemendkirina hinek kovar û rojnameyên bi kurdî xebatê dike.

**9)** Li gorî derfetan ji bo weşandina berdewamiya "Bûltena YRWK'ê xebatê dike.

**10)** YRWK–navend, plansaziya komên xebatê (ku di konfersana 5'an de hatine damezirandin) çêdike.

**11)** YRWK–navend, di nava vê salê de kar û barên konferansa çand û hunera Kurdistanê ya 3' yemîn plan dike.

**SÎRWAN REHÎM/ KÖLN**

www.arsivakurdi.org

# Ewên li derve heval in heval

*Hevalên xoştivî, zarokên hêja, ji niha pê ve, car caran emê bi we re rûnin û li ser daxwazên we emê dûr û dirêj bi hev re bipeyivin. Heger hûn karibin, car caran bêne seredana me, wê hîn baştir bibe. Bi hatina we ya cem me, emê gelekî rûgeş û dilşad bibin.*

*Di vê heftiya rabûrî de, hevalek ji welêt hat seredana me û du, sê rojan me mêvandariya wî kir. Niha em navê wî nabêjin. Hûnê di hevpeyvînê de bibînin. Vêca, gelî zarokên ji welatê pîroz, heger hûn jî, bi çend peyvên xwe yên nazdar, pişikdariyê di rûpelê xwe de bikin, hûnê me dilxweş û şad bikin. Daxwaza me, bextewerî û serkeftina we ye. Em bendewarên name û qerf û yariyên we ne gelî zarokan.*

**Tu bi xêr hatî keko, tu dikarî navê xwe ji me re bibêjî?**

–...Navê min Çîço ye ...Çîço Cangîr e.

**Tu kengî ji welêt hatî û tu hatiyî çi?**

– Ev du roj in ez hatime. Bavê min li Stenbolê kar dike. Ez hatime bavê xwe bibînim û hinekî jî ji xwe re bigerim.

**Navê gundê te çi ye?**

– Navê gundê min Mexerê ye.

**Çîço can, li gund, pez û dewarên we hene?**

–Hinek bizin û mîhên me hene. Berê çêlekek mala bapîrê min hebû, lê bapîrê min ew firot. Li şûna çêlekê, nigonek kirîn.

**Tu car caran diçî ber pêz?**

–Carina bi bêrîvanan de diherim ber pêz. Biharê berxik û karikên me hebûn. Ez û kurmamê xwe Heso, bi hev re diçûn ber wan.

**Tu û kurmamê xwe Heso çend salî ne?**

–Ez 9 salî me. Kurmamê min jî 14 salî ye

**Çîço, her sibe taştiya te li malê çi ye? Ango, hûn her sibe çi dixwin?**

–Ez çi dizanim ma! çay e, şorbenîsk e, şorbeşîşk e, şorbeşîr e, mast e, sertûk e, penîr e. Em vana hemûyan dixwin.

**Hûn, zarokên gund carina bi hev re dileyîzin?**

–Erê.. em her roj dilîzin.

**Navê leyîstikên we çi ne?**

–Hiloçakê, çavgirtokê, veşartokê...

**Hûn carina şer,meran dikin, hûn li hev dixin?**

–Ma bêşer çêdibe? Helbet em li hev dixin.

**Çima, li ser çi hûn şer dikin?**

–Na... ne tiştekî baş e. Ma bira, bira bikuje, ma qey tiştekî baş e?!.



**Çîço (li aliyê rastê) bi xwişk û birayên xwe re.**

**Carina cendirme tên gundê we?**

–Erê, tim tên gundê me. Bi tanzeran (Panzeran) tên gundê me. Wan rojên han dîsa hatin gundê me û kûçikek çû pêşiya wan. Rabûn bi trompêlê li kuçik dan û ew kuştin.

**Gava ku cendirme tên gundê we, hûn ji wan ditirsin?**

–Na...,çima emê ji wan bitirsin... Berê em ji wan ditirsiyan.

**Çima cendirme tên gundê we?**

–Nizanim.

**Te carina dîtiya ku cendirman û hinekan şer kirine?**

–Erê, di televîzyonê de min dîtiye.

**Na Çîço, na ne di televîzyonê de, li nêzîkî gundê we, yan jî, li çiyayên derdora we...**

–Haa...! Erêêêê.... Me gelek caran dîtiye. Yên derve û cendirme, her roj li hev dixin. Tu ji kesekî re nebêji haaa......

**Na na Çîço, netirse, ez ji kesekî re nabêjim.**

–Em şevekê li derve radizan. Hema van çaxan bû, (dema hevpeyvîna me digel Çîço, demhijmêr 10'ê şevê bû.). Stêrk li asmana diçirûsîn. Me dît carekê bû gurmîna tivingan. Cendirma û yên derve şer dikirin.Te bidîta, fûşekên wan wek stêrkan vêdikêtin û çawa li nav hev diketin.

**Şerê wan xweş bû?**

–E...tew li Qurtelanê tu bibînî, her roj şer e.

**Çima cendirma û yên derve şer dikin Çîço?**

–Ew.. diyar e neyarê hev in.

**Baş e Çîço, tu diçî fêrgehê?**

–Fêrgeh çi ye? yanî gund?..

**Fêrgeh mekteb**

–Haaa...Mekteb!? Ezê îsal herim sinifa sisiyan.

**Tu dizanî bi kurdî bixwînî?**

–Ez hemû herfên kurdî dinasim. Havêya ku şewqe li ser (destê xwe datîne ser tîpa "î" ma ev ne 'î' ye?)

**Tu bi kurdî dixwînî?**

–Erê...,li mala me kitêbên kurdî hene. Kitêba Cîgerxwîn heye, Siya Evînê heye, Evîna Welat heya, çîrokên kurdî hene, kitêba Navên Kurmancî heye, ez hemûyan dixwînim. (Çîço li kaxiza ber min dinêre ku ez van dinivîsim û dibêje) Wê.. ma qey tu dinvîsînî? Ha vêcarê em çûn.!

**Çima çîço, ma qey tu ditirsî?**

–Ma ne wê gilyê me bikin, gilî...vêca wê cendirma bên ser mala me...

**Dê baş e Çîço, ewên li derve kî ne?**

–Ez çi dizanim..Ewên li derve heval in, heval. Ma tu nizanî?

**Xuşk û birayên te hene?**

–Erê, birayekî min û du xuşkên min hene.

**Navê wan çi ye?**

–Ji min mezintir xuşka min Elîfe. Piştikê wê jî ez im, bi dûv min re birayêm in Mehdîzan e û biçûka me hemûyan xuşka min Şevîn e

**Tu dê kengî herî welêt?**

–Ezê sibê herim.

**Te bêriya malê kiriye?**

–Min gelekî bêriya xuşka xwe Şevînê û çîçika xwe kiriye.

**–Tu bixêr biçî Çîço can. Bi hatina te em gelekî dilxweş bûn. Em sipasiya te dikin û silavên me bigihîne hemû hevalên xwe, bila..**

–Bila, ezê silavê bigihînim hevalên xwe. De, bi xatirê we.

**HEVPEYVÎN: DILDAR ŞEKO**

# NAMEYÊN XWENDEVANAN

## Hewara çand û muzîka kurdî

Di dîroka kurd û Kurdistanê de cihê herî (tewrê) girîng çand û muzîk digire. Ev yeka, bi rastî vê gavê jî girîngiya xwe şîn û şahiyên xwe bi vî awayî daye der. Muzîka kurdî di nav gel de wekî derman hatiye dîtin. Bi rastî jî derman e. Neteweya me ji ber coxrfyaya ku li ser dijî, hem ji destê xwe bûye (tebîat) hem jî ji destê neyarên xwe yê dinê, gelek kul û derd kişandine û li hember (dijî) wan şer kiriye. Lewma, (ji ber vê sedemê) muzîka kurdî her dem bi pêş ve çûye. Kurd hatine kuştin, qirkirin, lê muzîk bi şûn ve neçûye, an jî nemiriye. Hîn jî ev yekana bûne sedema xurtbûna muzîkê. Ez vê dabaşê pir dirêj nekim, ev ji aliyê herkesî ve tê zanîn.

Ziman û mûzîk birayên hev in, bi hev ve girêdayî ne. Hîmê wan yek e. Yek bi muzîkên dinê re têkildar bibin. Muzîka me pir xalis e. Gel, vê muzîka xalis diparêze, yanê, gelê me bi dengê xwe, ji klasîkan (klamên dengbêjan) hez dike û bi van jî têr nebûye. Em hîna nizanin muzîka xwe çêbikin, lê emê çawa dest bavêjin muzîkên din. Bi vî awayî em dikarin muzîka xwe di cihê wî de bi cih bikin ?

Banga min li muzîkvanên kurdan re ev e ku dev ji muzîkên xelkan berdin û bizivirin ser muzîka me. Bila muzîka kurdî nemire, bes êdî hat talankirin.

**Belengaz/ Mûş**

## Sinet baş e lê ne di qurm re!

Silav bo welatparêzên li her çar parçeyên Kurdistanê. Gelî hevalên birêz çend rexne, an jî peşniyarên min li ser Tv'ya MED'ê hene? Birastî gelek caran di halê xwe de, ez ji TV–MED'ê aciz dibim. Bila kêfa neyaran xweş nebe. Acizbûna min wekî di malê de şerê di navbera dê û dotê ye.

Di Tv'ya MED'ê de, bernameyên bi tirkî pir tên weşandin. Ez ne dijberê bernameyên bi tirkî me. Mînak: Di bernameya "jin û jiyan" de nav bi kurdî, axivîn bi tirkî ye. Hunermendên bi tirkî dibêjin jî gelek in û peyam bi tirkî jî tên gotin. Bi taybetî birêz Dara Kutlay di hemû bernameyên xwe de bi tirkî diaxive. Di peyamê de hate gotin ku PKD'ê biryara kampanyayekê standiye; kampanyaya: "Bi kurdî fikire, bixwîne, binivîsîne." Pişt re bernameya "Jin û Jiyan" derket, belê bi tirkî. Ez dikarim bêjim di Tv'ya MED'ê em ji soranî û zazakî bêpar in. Bi rastî bêîmkanbûn û tengasiyên xebatkarên Tv–MED'ê jî li ber çavan in. Hêviya min ew e ku girîngiyê bidin penaberên bakur û li başûrê Kurdistanê, bibine dengê wan. Em li hêviya peşniyar ên karkerên Tv–MED'ê ne ku ji me re bêje. Em çi peywiran dikarin bikin bo xurtkirina Tv'ya xwe. Bimînin di xweşiyê de.

**Rêber Ronî**

## Li ser alfabeya Bedirxan

Roj baş, roj ronahî be û rûyê we biken be. Di xebatên we yên neteweyî de, serkeftinê dixwazim.

Birayê min yên hêja. Karbidestên rojnameya me. Min vê heftiyê nivîsa Rojhat Azadî li ser alfbeya me xwend. Gelek bandoreke neyînî li min peyda bû. Yahû êdî bi dîtina min, ne pewist e ku mirov, behsa rexnekirina alfebeya Bedirxan Beg bike. Di sala 1991'î de min dest bi xwendina zimanê me bi alfabeya latînî kiriye. Berî vê, ji sala 1981'î bi vir ve min bi alfabeya erebî, zimanê kurdî, di pirtûkên wek mewluda Melê Batê, Nubihara Ehmedê Xanî de xwendiye. Bi rastî wek alfabeya Bedirxanî xweş, şîrîn û zelal tu alfabe bi min ne xweş in. Hûn bawer bikin em nikarin bi wan alfabeyên din zimanê xwe bi dilxweşî hembêz bikin.

**Bekîrhan Yıldız/Amed**

www.arsivakurd.org

## Ji Welatê Me

SAMÎ TAN

# Zimanê me rûmeta me ye

Di gel rûdanên baş û xerab hefteyeke din jî kuta bû û tevî hemû kêmasiyan me hejmareke nû gihand destê we. Ez bawer im ku haya piraniya xwendevanên me ji girtina Berpirsiyarê Karê Nivîsaran ê Welatê Me (yê berê) Mehmet Gemsiz heye. Ji ber ku li dadgehê wî tevî Xwediya rojnameyê Aynur Bozkurt, xwestibû parêziya xwe bi kurdî bike, ji aliyê DGM'ya Stenbolê ve bi biryareke nehiqûqî ew hatibû girtin. Gemsiz di danişîna roja sêşemê (18'ê tîrmehê) de hate berdan. Em bi vê yekê gelek dilşad bûn, lê helwesta nebaş a dozger û dadgerên tirkan li hemberî zimanê kurdî hê jî didome. Em jî xebatên xwe yên ji bo danpejirandina zimanê xwe bi vê saziya dewletê didomînin û her emê bidomînin jî. Dewlet nivîsên me yên bi kurdî qaşo dide wergerandin û dozê der barê de vedike, piştre jî zimanê kurdî wekî "Zimanekî ku jê nayê fêmkirin" bi nav dike. Em vê bêhiqûqiyê û neheqiyê tu car qebûl nakin.

Gelî xwedevanan, li dûv daxwaza we, me cihê ferhengokê berfirehtir kir. Daxwaza ku me hefteya çûyî kir, em dixwazin dûbare bikin; heke hûn tevî nivîsên xwe ferhengokekê jî ji me re bişînin, emê kêfxweş bibin. Her wiha em dixwazin xaleke girîng bi xwendevan û nivîskarên xwe bidin zanîn; ji nivîsên ku li ser navê kesan derdikevin, xwediyên wan berpirs, ango mesûl in. Lewra dema şîroveyek an rexneyek di nava gotarekê de cih bigire, ew xwediyê nivîsê eleqedar dike. Lê divê kes li ser navê rexneyan daxwaza weşandina heqaretên şexsî, çêr û dijûnan neke. Di heman demê de divê bê zanîn ku nivîs li gorî hinek pîvanan tênê nirxandin û piştre tênê niqandin. Her çiqas hin caran nivîs li gorî pêdiviya rûpel bê kurtkirin jî, em dixwazin ev tişt jî li gorî dilê nivîskar çêbe. Bi dîtina me tiştê herî baş, kurt nekirin e. Ji ber vê yekê em tika dikin ku nivîskar gotarên xwe kurt bigirin, ji bo ku di rûpel de bi rehetî cih bigirin. Her wekî tê zanîn rûpelên mişt nivîs xwe nadin xwendin û di rojnameyê de divê bi wêne û spotan jî bên xemilandin. Em li benda pêşniyarî, rexne û berhemên we ne. Kampanyaya zimanê kurdî didome, zimanê me rûmeta me ye divê em li zimanê hemû nirxên neteweyî xwedî derkevin.

Belê xwendevanên hêja heta hefteyeke din bimînin di nav xêr û xweşiyê de.

# Baca ewlekarî an jî ya mirîşkan

Wan rojê borî, Berpirsiyarê Giştî yê Ewlekariyê Mehmet Ağar wiha digot: "Baca gemarê ya xaniyan û hwd. heye, divê ji vê demê û pê ve baca ewlekariyê jî hebe."

Wekî di dema Osmaniyan de padîşah, ji bo ku dewleta wî ji xizaniyê xelas bibe gelek bac derxistin. Dinihêre ku dîsa pere têra wî nake, difikire bangî wezîrê xwe û jîrikê xwe dike dibêje: "Çareyekê ji vî karî re bibînin." Wezîrê wî û jirîkê wan difikirin. Yek ji wan dibêje: "Padîşahê min ezê çareyekê bibêjim." padîşah dibê: "Ka bibêje"

Jîrik dibê: "Sê bac, hene ku em derxînin: 1. Baca mirîşkan ê ku mirîşkên wan hebe, ewê bacê bidin. 2. Baca mêrên ku ji jinê xwe bitirsin. 3. Baca kesên ku serê wan rût be (gurî be). Emê van bacan deynin ser gel" Padîşah diecibîne û destûrê dide wan, û dibê: "Zû van bacan bistînin." Wezîrê wan karê xwe dikin û bacan derdixin û ji gel dixwazin.

Karmendê wan rojekê diçin mala gundiyekî, dinihêrin ku mirîşk li mala wî hene. Bangî xwediyê malê dikin. Dibêjin: "Ev mirîşk ên te ne?" Gundî dibêje: "Erê" Dibêjin. "Wele baca wan heye, tuyê bidî." Gundî dibêje: "Aman, hewar ma baca mirîşkan jî çi ye, wele wê jina min bixeyîde, nabe." Dema wisa dibêje, karmend dibêje: "Aha, wele baca dudiyan jî tuyê bidî, tu ji jina xwe jî ditirsî." Dema wisa dibêje, gundî hêrs dibe û êrîşî ser karmendan dike û bi wan re şer dike. Dema şer dikin destê karmendekî digihîje serê wî, perûka wî dikeve, dinihêre ku gurî ye jî. Bang dike dibêje: "Baca sisiyan jî derket, baca sisiyan jî derket!." Bi wî awayî sê bacan ji gurî distînin.

Ê hikûmeta tirkî jî wiha ye, ji bo şerê gemarî dom bikin pere nemane. Tu baca nema ku dernexist. Baca ava gemarî, baca tozê, baca xaniyan û hwd. rojekê ev bac jî heke derkevin em şaş nebin: "Baca porzerikan, golikan, baca jin û mêrên ku şer dikin, baca kerr û lalan, baca pozxwaran, baca pozmezinan, baca kesên ku bi tirkî nizanin, baca şeştiliyan, baca nîvçemêran û baca qelew û mezinan û hwd.

ÇIYA MAZÎ

# Lêborîn û serrastkirin!

"Letîf Helmet, di xortaniya xwe de di nav rêzên Partiya Komunîstî Iraqê (PKI) de cih digire, demeke dirêj, digel vê partiyê dimeşîne. Di vê navberê de dest bi nivîsîna helbestan dike. Her wisa di kovar û çapemeniya vê partiya navbirî de, bi taybetî û di çapemeniyên Kurdistanî de bi giştî, gelek helbestên wî hatine weşandin. Helbestên Letîf Helmet, di destpêkê de hemû li ser çîna karkeran bûn. Belê, ji sala 1988'an û pê ve, bêhna neteweyî ji helbestên wî bi xurtî difûrin."

Ev paragrafa jor, di hejmara rojnameya me ya 35, rûpel 13, di nav nivîsa "Her welatê bûbe zîndan bîsutênin" de derbas bûbû. Nivîs ji aliyê nivîskar Sîrwan Rehîm ve hatibû amadekirin. Lê ev paragrafa jor, ne aîdî Sîrwan Rehîm bû û ev şaşî, ji aliyê redaksiyona rojnameya me ve hatibû kirin. Ji bo vê xeletiyê, em hem ji helbestvan Letîf Helmet, hem ji nivîskar Sîrwan Rehîm û hem jî, ji xwendevanên xwe lêborînê dixwazin.

**Heyeta Weşana Rojnameya Welatê Me**

# FERHENGOK

**Araste:** Guhertina berê tiştekî ber bi tiştekî din (yöneltmek)
**Arişe:** Pirsgirêk
**Babet:** Mijar
**Berevanî:** Dîfa' (Li hemberî neyaran gelê kurd berevaniya xwe dike)
**Çak:** Baş, zor baş
**Çeper:** Kozik, sîper.
**Delîve:** Keys, fersend
**Destkeftî:** Xenîmet (Di vî şerî de destkeftiyên gerîla..)
**Encam:** Netîce
**Goncandin:** Aheng, lihevkirin (Pêşniyarên dewletê, digel daxwaza me nagonc e.)
**Heder:** Telef (Bila ev westana me heder neçe.)
**Hejî:** Layiq (Leyla zana, hejî xelata navneteweyî ye)
**Jîndarî:** Hebûn, zindîbûn
**Kêferat:** Gava di ber mirinê de
**Kiryar:** Kirina karekî
**Nakokî:** Lihevnekirin (çelişki)
**Navgîn:** Wesîte, yê ku di navbera du kesan de diçe û tê
**Palpişt:** Destek, alîkar,
**Peywendî:** Têkilî, alaqat
**Serkeftin:** Zafer
**Sernigûnî:** Şikestin, têkçûn
**Şiyan:** Taqat, enerjî
**Temet:** Biqasî, biqanda (Bejna vî xortî temet sipindarekî dirêj e)
**Tûşîbûn:** Lêrasthatin, (İsal em tûşî belayeke mezin bûn)
**Werar:** Geşedaneka suruştî (evrim)
**Xweragirtin:** Li hemberî tiştekî zor û giran mirov karibe xwe bigire.
**Ziyan:** Zerar


## AGAHIYÊN ABONETIYÊ

**Min Welatê Me Divê**

| | Li Hundir | Li Derve |
|---|---|---|
| ☐ 3 Meh | ☐ 550.000 TL | ☐ 45 DM |
| ☐ 6 Meh | ☐ 1.000.000 TL | ☐ 80 DM |
| ☐ 12 Meh | ☐ 1.800.000 TL | ☐ 150 DM |

**Bedelê Abonetiyê ez radizînim**

**Li Tirkiyê** – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti. Yapı–Kredi Parmakkapı Şubesi Hesap No: 1100264–1

**Li Derve** – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti. Yapı–Kredi Parmakkapı Şubesi Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507–3

**NAV Û PAŞNAV** : ..................
**NAVNÎŞAN** : ..................
..................

**Navnîşana Welatê Me**
Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.
**Tel–Fax:** 293 53 19 – 293 53 20



Rojnameya Hefteyî
**(Haftalık Gazete)**

Li ser navê
ROZA Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti. adına
Xwedî (Sahibi)

**Aynur BOZKURT**

...............

Heyeta Weşanê
(Yayın Kurulu)

**Sami TAN**
**Suut KILIÇ**
**Aynur BOZKURT**

...............

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran
(Yazıişleri Müdürü)

**Metin AKSOY**

...............

**NAVNÎŞAN (Adres)**
Ayhan Işık Sok. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL

**TEL–FAX**
293 53 19 – 293 53 20

**ÇAPXANE**
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

**NÛNERÎ**
(Temsilcilikler)

**Suriye–** Jan Dost
Fener Rojbiyanî
**Berlin–** Silêman Sido
Sîrwan Reşîd
49-30-69 00 26 95
**Hannover–** Selîm Biçûk
49-5721-813 60
**Hamburg–** A.Hekim Gülsün
49-40-40 33 88
**Munchen–** Mahmut Gergerli
49-871-670 884
**Badenwurttenberg–**
A. Rahîm Ayaz
49-75453258
**Amsterdam–** Cotyar Zaxoy
31-20-613 07 66
**Paris–** M.S. Ayçiçek
33-1-48000401
**Atîna–** Ferhan Zêbarî
30-13634905
**Bruksel–** Medenî Ferho
32-16-49 07 67


www.arsivakurdi.org

BANGAWAZIYA SEROKÊ GIŞTÎ YÊ PKK'Ê ABDULLAH ÖCALAN JI BO KURDÊN SOVYETA BERÊ

# HÛN JÎ GAVEKÊ BIAVÊJIN!



**Bi rastî jî mirovê kurd, ji hemû aliyan ve hatiye xistin. Em li cîhanê binêrin, temet (bi qasî) şexsiyeta mirovê kurd, şexsiyeteke wisa belengaz nayê dîtin. Mirovê kurd, ketiye rewşeke wisa ku êdî nema tê naskirin. Daxwaza min, ne êşandina we ye. Daxwaza min xurtkirina we ye, bihêzxistina we ye. Lê hûn ji vê yekê re çiqas amade ne? Hêza we ango xurtiya we çiqas e? Hûn çiqasî bi gelê xwe re ne? We doza welatê xwe, heta bi çi radeyê ji xwe re kiriye xem û bar? Ezbaş dizanim ku hûn, ji bo xelkê hene; ji bo hinek dewletan ji bo berje-wendiyên wan hûn hene, wan bi we lîstine.**



**Li gorî Öcalan kurdên Sovyeta berê, bi tevgirêdanê û bi livbaziyan dikarin xwe bi pêş ve bibin.**

Ji bo wan kurdên ku ji nav Sovyetê hatine, em dixwazin bipeyevin. Ne bes ji bo wan, ji bo tevaya gel emê bi kurdî hinek nirxandinan pêk bînin. Li vir xebata ku ez dikim, ji bo paqijkirina gemar û jenga (zenga) hezar salan e. Ji hemû aliyan ve kêmasî hene. Em nema dizanin, gel sax e, an miriye. Emê vê rewşê biguherînin.

Bi rastî jî ceng, ji bo me hem moral e, hem serxwebûn e û hem jî azadî ye. Dijmin dixwaze hemû destkeftiyên me heder bike. Lê em bi vê ezmoniya (tecrubeya) xwe ya partî û ya cengê, me divêt destkeftiyên xwe hêj berfirehtir bikin. Dostên mîna we ku ji hemû deverên Kurdistanê hatine, ji bo vê yekê dilxwaz in û ji nezîk ve çavdêriya cenga me dikin. Dixwazin xizmetekê bikin. Lê ev xizmet, bi rastî jî bi xwedî lêderketina şexsiyetê mumkûn dibe. Tevaya gelê me dostê me ye. Ne bes dost e jî, bingeha bizava me ye. Cenga me jî, cenga gel e. Belê digel wisa jî, gel ji zanînê hatiye bêparkirin. Bi taybetî di babetê cengê de hatiye xapandin. Hebûna vî gelî bes di berjewendiya dijminan de bûye. Hemî rengê lîstikan li ser gelê me hatiye lîstin.

Bi rastî jî mirovê kurd, ji hemû aliyan ve hatiye xistin. Em li cîhanê binêrin, temet (bi qasî) şexsiyeta mirovê kurd, şexsiyeteke wisa belengaz nayê dîtin. Mirovê kurd, ketiye rewşeke wisa ku êdî nema tê naskirin. Daxwaza min, ne êşandina we ye. Daxwaza min xurtkirina we ye, bi hêzxistina we ye. Lê hûn ji vê yekê re çiqas amade ne? Hêza we ango xurtiya we çiqas e? Hûn çiqasî bi gelê xwe re ne? We doza welatê xwe, heta bi çi radeyê ji xwe re kiriye xem û bar? Ez baş dizanim ku hûn, ji bo xelkê hene; ji bo hinek dewletan, ji bo berjewendiyên wan hûn hene, bi we lîstine. Û tiştek jî nedane we ji ber ku wisa hûn bi paş de hêlane keys û derfet nedane we, di hemû waran de hûn bi şûnde mane û ziyan gihiştiye we. Lê em binêrin, tenê ji bo gel em napeyivin, em şer jî dikin.

### Ceng ji bo şikandina zincîrên koletiyê navgînek e

Cenga me, cenga gel e. Partî ne di ser gel re ye, di xizmeta gel de ye. Hevalên ku di nav cengê de li ser navê partiyê dixebitin, bi canê xwe, di xizmeta gel de ne. Ceng, ne armanca me ye, lê ji bo şikandina zincîrên koletiyê navgînek e. Ji ber vê çendê ye ku partî bi cengê radibe û rabûye. Helbet, gel jî êdî ne gelê berê ye. Ji hemû layan (aliyan) ve kûr diçe ser meseleyê, ji gelek layan ve pişikdariyê di meseleyê de dike. Jixwe gel çiqasî lawaz (zeîf) be, partî jî ewqas lawaz dibe.

Ev bi hev ve girêdayî ne. Hevdu temam dikin. Hêza we jî bi vê yekê ve girêdayî ye. Dijmin, jiyana me pûç kiriye; ne can, ne mêjî û ne jî dil bi me re hiştiye. Dawiya hemûyan aniye. Em dixwazin van hemûyan ji nû ve bi cih bikin. Helbet ji bo bicihkirina van em xizmetê dikin û em ne tengezarê vê xizmetê ne. Belê yên ku ji xizmeteke baş têdigihên û yên ku digel me heta mirinê ji bo vê xizmetê bimeşin, gelek kêm in.

**Dûmahîk Rûpel 7**

**elînewêrek**






www.arsivakurdi.org